1 Hezîranê
Rojnameya we
Azadiya Welat


Azadiya Welat
Zarokên kurd ên dîgi
RÊBERÊ PKK'Ê ABDULLAH OCALAN DÎSA BANGA DIYALOGÊ KIR
'Heta meha hezîranê divê gav bên avêtin'
KDP-Îran: Başûrî erênî nêzîk nabin
Ocalan ji dewletê xwest ku heta meha hezîranê ji bo çareseriya demokratîk bikeve nava tevgerê. Ocalan encamên hilbijartinên 29'ê Adarê jî mîna "Şoreşa Demokratîk" bi nav kirin

li bayiyan e




## Diyarî Uysal kirin

3'yemîn Rojên Fîlmên Kurdî yên Hamburgê ku ji aliyê Yekîtiya Xwendekarên Kurd (YXK) û Navenda Jinê Nûjiyan ve hatibû organîzekirin bi dawî bû. Rojên fîlman diyariyê derhêner, rojnameger û gerîla Halîl Uysal bû. Bi giştî fîlmên sînemaya kurdî yên di sala 2008-2009'an de derketin hatin nîşandan. Bi taybet jî fîlmên bi mijarên wekî koçberî, îşkence, tevgera ciwanan, azadî, evîn, hezkirina welat derketin pêş.




## Baholek û du ziman

Mamoste dema dest bi pirsan dike zarokên yekem car ev ziman bihîstîn, ker û lal dibin. Ji bo wan coşa destpêkirina perwerdehiyê û fêrbûna tiştên nû li cihekî ye, tirsa mamoste dikeve dilê wan. Belgefîlma Baholek û Du Ziman di warê qedexeya ziman de gelek tiştan tîne ziman... **RÛPEL - 6**

## Li Amedê awazên kurdî bilind dibin

**Di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de hunermendên kurd Ayfer Duzdaş û Mehmet Akbaş derketin ser dikê û stranên xwe bi hemû zaravayên kurdî gotin**

Di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de bernameya danasîna mîhrîcanê û konsera ku hunermend Ayfer Duzdaş û Mehmet Akbaş beşdar bûn, li Şanogeha Anfî ya Sumer Parkê pêk hat. Konsera ku pêşkeşvaniya wê şanoger Kemal Ulusoy kir di televîzyonan de zindî hat dayîn. Ji ber eleqeyê gelek kes li ser piyan man û cihê rûniştinê nedîtin. Cigirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek axaftinek kir û anî ziman ku 9 sal in bi coşeke mezin mîhrîcan li dar dixin... *R.6*


Mehmet Akbaş bi hemû zaravayan ji amediyan re stra.


# HAWAR
Rojnameya Rojane
29 Gulan 2009
În
Sal: 1
Hejmar: 24
Buha: 50 Kr


## Li Amedê banga agirbesta dualî



Li Amedê 72 rêxistinên sivîl ên demokratîk ku daxuyaniyeke hevpar dan, diyar kirin ku operasyonên tên meşandin pêvajoya agirbestê têk dibin û pêşniyar kirin ku PKK jî biryara xwe ya bêçalakitiyê dirêjtir bike... *R.4*

## Dozger xebatên DTP'ê didarizîne

Ji aliyê dozgeriya Amedê ve der barê doza DTP'iyan de îdianameya yekemîn hate amadekirin. Der barê endamê DTP'ê Serdar Zigrî de îdianameyeke ji 147 rûpelan pêk tê ji aliyê Serdozgeriya Amedê ve hate amadekirin. Di îdianameyê de piranî xebatên hilbijartinê yên DTP'ê û rêveberiyên herêmî wekî xebatên KCK'ê tên binavkirin. Bi îdianameyê derket holê ku bi hezaran telefon hatine guhdarîkirin û gelek sazî, mal û qadên cemaweriyê hatine guhdarîkirin. Di îdianameyê de tê îdiakirin ku Meclîsa Tirkiyeyê ya KCK'ê di bin banê DTP'ê û gelek saziyên din de xwe bi rêxistin kiriye û bi awayekî pergaleke dadî, rêveberiyên herêmî û qada civakî ava kiriye. Balkêş e ku piştî vê îdiayê yek bi yek xebatên DTP'ê yên ji bo hilbijartinê û rêveberiyên herêmî tên rêzkirin. Her wiha Şêwirmendê DTP'ê Sabrî Ok jî wekî berpirsiyarê vê rêxistinê tê nîşandan. Gelek çalakiyên DTP'ê yên wekî; beyankirina îradeya siyasî, çalakiyên rûniştinê û daxuyaniyên çapemeniyê yên ji aliyê saziyên sivîl û demokratîk ve hatine dayîn wekî karên îlegal tên binavkirin.

## Bi tenê du roj ji 1'ê hezîranê re man

# KÎ BI AGIR DILÎZE?

1'ê hezîranê nêzîk dibe û li şûna ku pêngavên ji bo çareserî û aştiyê bên avêtin, her wekî hêzeke tarî ketibe dewreyê, operasyonên leşkerî hatin zêdekirin û operasyon dibin sedema kuştinan. Her wiha rêveberên KESK'ê bi îdiaya PKK'î ne hatin binçavkirin



### ÇIMA ŞER Û OPERASYON?

Bi nêzîkbûna 1'ê hezîranê re her wekî hin hêzên dewleta kûr pêlî bişkoka xetereyê kiribin pêngavên tahrîk û provokasyonê hatin zêdekirin. Operasyonên leşkerî hatin zêdekirin û bûn sedem ku li Çelê 7 leşker jiyana xwe ji dest bidin.

### HEDEFA NÛ SENDÎKA NE

Li hemberî KESK'ê di heman demê de li 5 bajaran bi hev re operasyonek hate lidarxistin. Di operasyonê de 34 kes hatin girtin. Operasyona li dijî KESK'ê wekî li dijî 'rêxistina terorîst' hat binavkirin. Li Îzmîr, Enqere, Wan, Stenbol û Manîsayê operasyon çêbûn.

### DIXWAZIN ÇI BIKIN?

Li gorî çavdêrên siyasî armanca lidarxistina operasyonên leşkerî yên li deverên stratejîk ew e ku ji her du aliyan windahî çêbin û bi vî awayî baweriya ji bo aştî û diyalogê ji holê bê rakirin. Li gorî çavkaniyên herêmî operasyonên leşkerî bi zanebûn hatin zêdekirin.

## Banga jinan a mîtîngê

Jinan li Amedê ji bo mîtînga xwe ya dê di 31'ê gulanê de li Amedê pêk bê belavok belav kirin. Parlamenterên DTP'ê yên Amedê Gultan Kişanak, Aysel Tugluk û endamên DOKH'ê jî beşdarî belavkirina belavokan bûn... *RÛPEL - 7*

## 'Operasyon çareseriyê asteng dikin'

Şaxa ÎHD'ê ya Sêrtê der barê gerîlayên ku di encama operasyonên ku li herema Sêrtê pek hatî de jiyana xwe ji dest dabûn û cenazeyên wan nedane malbatên wan, raporek aşkera kir. Di raporê de hate gotin ku operasyon li ber çareseriya pirsgirêka kurd astengiyan derdixin û divê operasyon werin rawestandin. ÎHD'ê xwest cenazeyên malbatan jî ji wan re bên dayîn... *RÛPEL - 3*

## KESK: Armanca wan çavtirsandin e

Polîsan bi ser Navenda Giştî ya KESK'ê de girt. Sekreterê Giştî yê KESK'ê Emîralî Şîmşek, diyar kir ku serdagirtina li hemberî sendîkaya wan pêk hatiye ji bo çavtirsandinê ye û xwest pêkanîna derhiqûqî di demeke zû de bê rawestandin. Li-jneya Giştî ya Egîtîm Senê li hemberî operasyona li dijî KESK'ê û endam û rêveberên sendîkayê, nerazîbûn nîşan da.... **RÛPEL - 4**


www.arsivakurdi.org

# Egîtîm Sen dê cardin bibêje zimanê zikmakî

Egîtîm Sen ku di warê perwerdehiya zanistî û demokratîk de bi salan e kedeke mezin dide, di dawiya hezîranê de Kongreya Rêziknameyê pêk tîne. Serokê Şaxa Egîtîm Senê ya Amedê Abdullah Karahan daxuyand ku di rêziknameyê de xala ziman dê cih bigire

Serokê Şaxa Egîtîm Senê ya Amedê Abdullah Karahan anî ziman ku di Kongreya Rêziknameyê de dê xala ziman a di sala 2005'an de ji rêziknameya xwe derxistîn, dê cardin di rêziknameyê de bi cih bikin. Karahan diyar kir ku di encama daxwaza şaxên sendîkayê de ev serastkirin pêk tê. Egîtîm Sen di 30-31'ê gulanê de li Enqereyê di çarçoveya girîngiya zimanê zikmakî de konferanseke navneteweyî jî li dar dixe.

Egîtîm Sen ku di warê perwerdehiya zanistî û demokratîk de bi salane kedek mezin dide, di dawiya hezîranê de Kongreya Rêziknameyê pêk tîne. Serokê Şaxa Egîtîm Senê ya Amedê Abdullah Karahan diyar kir ku di dîroka sendîkayê de lêxwedîderketina zimanê zikmakî qrîtereke esasî ye û bi bîr xist ku sendîkayê ji ber zordayîna Serfermandariya Giştî ya li ser dadgehê mafê zimanê zikmakî ji rêziknameya xwe derxistiye.

**Serfermandariyê gilî kiribû**

Karahan anî ziman ku di sala 2005'an de Serfermandariya Giştî xala têkildarî zimanê zikmakî ya rêziknameya sendîkayê gilî kiribû û wiha got: "Xala zimanê zikmakî ya di rêziknameya me de bi taybetî ji bo komên xwedî dezavantaj hewcedariyeke demokratîk bû. Lê Serfermandariya Giştî zor da dadgehê û ligel pêşketina pêla şovenîst dadgehê biryara girtina sendîkaya me da. Sendîkaya me ligel ku karên baş jî kiribûn, hin tiştên kêm hatine hiştin jî hebûn. Me wê demê nedikarî xwe di nava gel de bidin îzahkirin. Hin nîqaş çêbûn. Heta dadgeha kar me mijar bir. Ji ber ku Dageha Kar biryarek neda pêvajo aloz bû. Me xwest bêyî ku yekbûna sendîkayê zirarê bibîne encamek derbikeve."

**Dozê birin DMME yê**

Karahan di dewama gotinên xwe de anî ziman ku wan tu caran derxistina xala têkildarî ziman a ji rêziknameyê di dilê xwe de nepejirandiye û wiha pêde çû: "Serokê me yê giştî yê wê demê îroniyek kir. Got, 'me xala têkildarî ziman şand betlaneyê'. Îro em vê xalê ji betlaneyê vedigerînin û em dê dîsa di rêziknameya xwe de bi cih bikin." Karahan got, ji ber ku herî zêde pirsgirêka kurdan a zimanê zikmakî heye, xala têkildarî zimanê zikmakî yek bi yek bi kurdan re hate girêdan, lê rastî ew e ku Egîtîm Sen ji bo hemû zimanên Anatolîayê heman tiştî difikire. Xalan ziman ji bo hemû komên xwedî dezavantaj bû û ev qrîtereka demokratîk a navneteweyî ye. Karahan bi bîr xist ku Egîtîm Senê pirsgirêk biriye rojeva Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û ev doz hêj jî didome.

**Sempozyumek navneteweyî pêk tê**


Karahan wiha got: "Li Tirkiyeyê çi dem mijareke têkildarî mafên demokratîk bê rojevê têkiliya wê bi pirsgirêka kurd re tê danîn. Dema mijareke têkildarî kurdan jî hate axaftin yekser tê terorîzekirin." 'Di pêvajoya borî de hin hewldanên bi niyeteke erênî pêk hatin. Di encamê de pêdiviya ji bo careke din cihkirina xala ziman a di rêziknameyê de derket holê'. Karahan di dewama van gotinên xwe de wiha got: "Di 30-31'ê gulanê de li Enqereyê sempozyumeke navneteweyî pêk tînin. Akademîsyenên navdar dê beşdar bibin. Mêvanên me yên tên dê vê mijarê nîqaş bikin. Ji bo ku ev mijar baş bê fêmkirin em vê sempozyumê pêk tînin. Beriya 4-5 mehan şaxên sendîkayê bi Navenda Giştî re nîqaşeke di vê çarçoveyê de dan destpêkirin. Herî dereng heta dawiya hezîranê dê Kongreya Rêziknameyê pêk bê. Di vê demê de hevdîtinên tomerî jî pêk tên. Mijareke teknîkî ye. Lê 5 roj zû yan jî 5 roj dereng ferq nake. Ev kongre dê pêk bê û dê xala têkildarî ziman bêguhertin cardin wekî bêrê di rêziknameyê de bê cihkirin."

**'Ji bo ziman pratîk divê'**

Karahan anî ziman ku di nava sendîkayê de ji bo vê xalê yekgirtinek heye, lê hin derdorên bi rast hatina demê fikarên wan heyî, hene. Karahan got ku rêzikname Egîtîm Senê bi giştî dê di ber çavan de bê derbaskirin û xala têkildarî ziman jî dê di vê çarçoveyê de bê cihkirin û wiha got: "Bi tenê cihkirina vê xalê di rêziknameyê de têr nake. Divê hin karên pratîk jî bêne kirin. Em sendîkayeke ku karê me perwerdehiye. Divê têkildarî xala ku dê di rêziknameyê de bê bicihkirin, kar û xebatên me jî çêbibin. Di noqteyê de pêdiviya sendîkaya me bi hevkariya saziyan û eleqeya civakê jî heye. Piştî Kongreya Rêziknameyê em ê vê bangewaziyê jî bikin. Ango, xala di rêziknameyê de bê cihkirin wekî formalîte na mîne. Pratîkeke li gorî girîngiya vê xalê jî dê pêk bê."

**'Ziman dê teqez bê cihkirin'**

Karahan herî dawî anî ziman ku pêşnûmeya rêziknameyê tê amadekirin û wiha got: "Di çarçoveya pêşniyarên ji şaxên sendîkayê hatine girtin xebat tên meşandin. Navenda Giştî nêrîn ji şaxan girtiye û ev nêrîn ji bo guhertina rêziknameyê wekî bingeh hatin girtin. Xala ziman teqez dê bê cihkirin. Ji vê noqteyê paşve gavavêtina Egîtîm Senê ne mimkûn e." **AMED**





Roşn

## Mamosta Silêman

mamoste.suleyman@hotmail.com

## Kesayetî û asîmîlasyon -II-

Rasta ey hedefê asîmîlasyonê; şexsîyetê merdiman o, erjayeyî cematan û şaran o. Tabî ewta de, tena ziwan, kultur û tarîxê kurdan talan nêbeno, çîyî yê madî zî tarûmar benî. Rayna ma zanî ke, polîtîkaya asîmîlasyonî, polîtîkaya menfeetê ra dûrî nîya. Yanî temelê polîtîkaya asîmîlasyonê de, menfeetê tayê şexsan û zumreyan esto.

Reyna temelê polîtîkaya asîmîlasyonî de, kulturê şîdet, kîn û nefretê esto. Çunku serdestî; sewbîna miletan, dînan, fikran qebul nêkenî. Xo vêşîr yewna miletan û mensubanî sewbîna dînan û fikran dişmen veynenî. Polîtîkaya gale û îşgalê esas gênî. Aye ra psîqolojîyê şarê xo, xora herimnawo, cîrananî xo zî rehet nêverdanî. Na polîtîkaya asîmîlasyonê, bi zorê dewlete û hetkaranî dewlete ramîyêna. Tirkîya de, esil problemî, na polîtîkaya asîmîlasyonî ra yenî meydan. Polîtîkaya Asîmîlasyonî, polîtîkaya înkar û îmha ya. Yanî kulturê kîn nefretê û ramitişê no cengê polîtîkaya asîmîlasyonî ra dûrî nîyî. Eke Tirkîya de nê hêris serî yo, se yew cengo qilêrin dewam keno, bi hezaran dewî veng bîyî, eger bi mîlyonan dewijan koç kerdo, reyna eke çewres hezar merdiman se heyatê xo, no cengo qilêrin de vînî kerdo, reyna bi hezaran merdimî se kuçan de kişîyayî û bi hezaran merdimî vînî bîyî, reyna bi hezaran merdimî hepisxaneyan de çormîş bîy û hima zî benî, sebebî nê heme hedîseyan, polîtîkaya asîmîlasyonî ya. Polîtîkaya asîmîlasyonî û no cengo qilêrinê kesayetîya şaranî Tirkîya, tarûmar kerda, şarê Tirkîya adeta yew trawma ra vêreno. Eke kuçan de, keyeyan de, mekteban de, şaristanan de, dewan de, hemen hemen her ca de, eke se hedîseyê cînayetan benî, hetta qetlîamî beni, sebebî nê cînayetan zî reyna na polîtîkaya asîmîlasyonî ya.

Rayna eke se ende dizdî, xortûmkarî çetey cirît fîynenî, sebeb reyna na polîtîkaya asîmîlasyonî ya. Eke menfeetperestey û sextekarey û heme bêj qilêrey zemîn veynena, sebeb na polîkaya asîmlasyon û antîdemokratîk a. Eke se huqûq beyntarê cuzdan, edelet û huqûq nêmendo, reyna sebeb na polîtîkaya asîmîlasyonî ya. Tirkîya de, eke se, yew zemîno demoratîk bibîynî, heme kesî xo bi azadî îfade bikeynî, nê heme nebaşey û gemarey û problemî nêbîynî. Yanî polîtîkaya asîmîlasyonî, no welato rind û delal, şaranî Tirkîya rê kerdo se cehnim. Armancê asîmîlasyonê ra yew zî, şarê; bê statû û bê rêxistin vîyardayîş o, bi eslê xo, ziwan û erf û edetê xo ra dûrî vistiş o, adeta xûsîsîyetanî xo yî mili ra dûrî vistiş o, nasname û kesayetî neteweyî ra mehrûm kerdiş o.

Rasta ey, şaro ke marozê polîtıkaya asîmîlasyonê maneno, ziwanê, kultur û nasname û heme erjayeyanî xo yê mîlîyan ra şermeyêno, xo ra, welatê xo ra, ziwan û kulturê xo ra hes nêkeno, adeta remeno. Kesayetê û pskolojîyê nê şarê herîmîyêno.

Albert Camus vano; welatê merdimê yo heqîqî, ziwanê merdimê yo, ez sîndorê ey de, nobedarey kena.

Konfîçyûs ra vanî; eger ma berpirsîyareya welatê bidaynî to, karê to ay yewin çi bîynî?

Vano ke; bêguman mi ko ziwanê ra dest pêbikerdinî. Semedo ke ziwan zelal nêbo, fikr hewayêko baş nîyno îfade kerdiş, eger fikr bi hewayêko baş nêro îfade kerdiş, kar bi hawayêko biserûber nîyno kerdiş, eger kar biserûber nêro kerdiş, edet û kultur zî herimîyêno, eger edet û kultur biherimîyo, ko edelet bikewe rayîro şaş, eger edelet rayîr ra vejîyô, hinê şar ko nêzanibo çi biko. Semedê na ra yew çîy zî sey ziwanê muhîm nîyo.

Kesayetî û nasnameyê merdiman de, ziwan û kultur yew cayo zaf muhîm gênî. Eke medim bi ziwan û kulrurê xo, xo îfade nêko, kê nişnî behsê azadey bikî. **Qedîya**



Beroj

## Azîz Ogur

abdulazizogur@hotmail.com

## Hezîran 2004-2009

Du biryarên girîng ên dîroka nêz ku bi 1'ê Hezîranê re têkildar in hene. Ev her du biryar jî di girîngiya diyarker a destnîşankirina pêvajoyên piştî xwe de ne.

Ya yekemîn biryara 1'ê hezîranê ya 2004'an bû. Pêşketin û sedemên girtina vê biryarê tên zanîn lê dîsa jî pêdivî bi vekirina wê heye. Hêzên navneteweyî û hevkarên wan ên herêmî bi komploya navneteweyî xwestin Têkoşîna Azadiya Kurdistanê bi şikandineke mezin re rû bi rû bihêlin û di nava demeke kurt de plana tasfiyekirinê bigihînin encamê. Lê belê tevgera Ocalan a li Îmraliyê rê li ber birina serî ya komployê girt. Berovajî têkçûna PKK'ê tevgereke li ser hev kombûyî û di qada siyasî de bandora xwe zêdekirî derxiste holê. Hêzên komploger vê carê jî bi pêşxistina tasfiyekariyê dest avêtin nava PKK'ê û bi destê hin tasfiyekaran xwestin ji hundir ve têk bibin. Di vir de hedefa bingehîn jî jiholêrakirina îradeya têkoşîna Parastina Rewa ya çekdarî bû. Di pêvajoyeke wisa de biryardayina Pêngava Xweparastina Rewa ya Çalak a 1'ê hezîran a 2004'an, mîna noqteya dawî ya li ber komplo û meremên ji holê rakirina îradeya gerîlayên kurd a xweparastin û parastina gelê kurd dikare were binavkirin. Mirov dikare pêşketinên heta roja me tên jiyîn, tev berhemên vê pêngava dîrokî ne. Pûç derxistina komplo û tasfiyekariyê, ji holê rakirina îdia û gotinên 'PKK di şerê çekdarî de têk çû' û bûyina sîgorte û hêza misogerbûna hebûna gelê kurd a gerîla, tev encamên vê pêngavê ne.

**1'ê Hezîrana 2009'an**

Piştî 5 salan pêngaveke din a berhemek ji yê pêngava 1'ê hezîrana 2004'an e jî biryara bêçalakîbûnê ya heta 1'ê hezîrana 2009'a ne. Mîna mînakên berxwedana Zapê, hilbijartinên 29'ê Adarê, Tevgera Azadiya Kurdistanê ku ji aliyê siyasî, girseyî, leşkerî û hêza bandorê ve derkete zîrveyê, pêvajoya bêçalakîbûnê ya heta 1'ê Hezîranê îlan kir û derfeteke dîrokî da aştiyê. Şensdayina aştiyê ya Tevgera Azadiya Kurdistanê ji mezinbûna wê tê. Bawerim ji amûrên şerê taybet ê kirêt pêde tu hêz, derdor an kes nikare bêje gavên Tevgera Azadiya Kurdistanê ên ji bo afirandina çasereserî û aştiyê mîna lawazî binav bike. Hin hêzên rantxur li Kurdistanê jî ji bo astengkirina pêvajoya çareseriyê û bêbandorkirina pêngavên Tevgera Azadiya Kurdistanê tiştek namîne nakin. Hikûmet a takiyevan ku ji aliyekî ve hin peyamên nerm dide û 'hêvî'yekê di nava gel de diafirîne ji aliyê din ve hêzên xwe yên diyar û veşartî dixe nava hewldanên tunekirinê. Zêdebûna operasyonên leşkerî yên li tevahiya bakurê Kurdistanê, rojane bombekirina Qadên Parastina Medyayê, operasyona li dijî DTP'ê û êrîşên li dijî jin, zarok û tevahiya gelê kurd tev provokasyonên têkbirina pêvajoyê ne.

Ev hêzên rantxur ji aliyekî ve operasyonên tunekirinê li dar dixin dibin sedema şehadeta gerîlayên di rewşa bêçalakîbûnê de ne, ji aliyê din ve jî hewldanên xweparastina ji operasyonên tunekirinê yên gerîla mîna amûrê propogandaya 'PKK bi biryarên xwe re ne dilsoz e' bikar tînin.

**1'ê Hezîranê destpêkeke nû ye**

Ji 1'ê hezîranê re 2 roj man. Gerîlayên kurd, gelê kurd diyar e ji aliyekî ve bijarka çareseriya aştiyane tim mîna alternatîfa yekemîn li ber çavan bigirin lê ji aliyê din ve jî ji bo xweparastinê tedbîrên misoger bistînin. Mîna biryara 1'ê hezîran a 2004'an biryara bêçalakîbûnê jî biryara destpêkirina pêvajoyeke nû ye. Her derdor bi lîstina rola xwe dikare vê pêvajoyê wergerîne ser zemîna aştî û çareseriyê ya ku gava yekemîn bêçalakîbûneke dualî be. 1'ê hezîranê ne encamek e li gorî baweriya min destpêkeke nû ye. Ev dem ji parastina rewa heta bi zexta girseyî û ketina tevgerê ya hêzên demokratîk ên Tirkiyeyê pêvajoyeke seferberiya çareseriyê ye. Di vir de dîsa fedekarî û rola diyarker dê ya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan be. Ocalan di hevdîtinên xwe yên dawî de ragihand ku ew li ser nexşeyeke çareseriyê dixebite û heta dawiya tebaxê ewê vê nexşeyê aşkera bike. Lê bi israr daxwaz dike ku her hêz û beşên civakê ên kurd û Tirkiyeyê bi pêşniyar, nirxandin û hewldanên xwe hêzê bidin vî karê pîroz ê dibe ku bibe kilîda çareseriyê. Lewma dem dema seferberiya ji bo afirandina zemînê çareseriyê ye.

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.** Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:***
Kooperatif Mahallesi
Gevran Caddesi 1 Geçit.
Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis
Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece
İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
***No:*** 44 Seyhan
Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurdi.org

# Wêzîrê Dadê rewşa girtîgehan înkar kir

## Girtî her roj ji ber îşkenceyên ku li girtîgehan û dema nexweş dibin li nexweşxaneyan li wan tên kirin daxuyaniyan didin û ÎHD jî belgeyên li ser van aşkera dike lê ligel vê jî Wezîrê Dadê Ergun di axaftina meclîsê de ev înkar kir

Wêzîrê Dadê Sadullah Ergun îdia kir k u di sala 2008'an de tu girtî tune ku pirsgirêka tedawiyê kişandibe. Li ser bûyerê ÎHD'ê raporek weşand û diyar kir ku di sala 2008'an de li girtîgehan 39 kes bi boneya tedawiya wan nehatiye kirin jiyana xwe ji dest dane, 18 jê giran bi giştî 306 girtî û hikûmxwarên nexweş jî hene.

Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn ku bersiv da pirsiyarnameya Parlamentera DTP'ê ya Stenbolê Sebahat Tuncel, îdia kir ku li girtîgehan pirsgirêkên tenduristiyê yên girtiyan nîn in. Ergîn angaşt ku di sala 2008'an de jî tu girtiyan ji ber ku nehatine dermankirin, jiyana xwe ji dest nedane. Di pirsiyarnameyê de hate daxuyandin ku heta 6'ê nîsana 2009'an hejmara girtiyên siyasî 5 hezar û 678 bûye. Ergîn da zanîn ku 42 kes bi boneya cezayê muebetê yê giran di koxuşên yekkesî yên Girtîgehên Tîpa F de tên girtin. Ergîn, derbirî ku kesên nexweşiya wan di asta kronîk de ye jî 153 kes in.

### Bi giştî înkar kir

Ergîn îdia kir ku tu nexweşên li benda dermankirinê nîn in û ev îdia anîn ziman: "Nexweş li nexweşxaneyên dewletê û yên zanîngehan tên dermankirin." Ergîn, îdia kir ku di sala 2008'an de girtî û hikumxwarên ji ber bêtedawîtiyê jiyana xwe ji dest dane nîn in. Ligel ku gelek girtiyên ji ber nexweşiya xwe ji bijîşkan rapora tahliyekirinê girtine jî Ergîn angaşt ku tu nexweşên ji ber nexweşiyên xwe nehatine tahliye kirin jî nîn in.

### ÎHD: Agahiyên Wezîr ne rast in

Lê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) di raporan de agahiyên berovajî îdiayên Ergîn dide. Li gorî rapora Navenda Giştî ya ÎHD'ê di sala 2008'an de 39 kesan ji ber ku nehatin tedawîkirin jiyana xwe ji dest dan. Her wiha li gorî daneyên komeleyê 18 jê giran bi tevahî 306 girtiyên divê ji ber nexweşiyên xwe bên tahliyekirin hene. **ENQERE / DÎHA**

## Girtiyan xwest ÎHD heyetekê bişîne

Girtiyên li 1'emîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê bal kişandin ser zordarî û binpêkirinên mafên mirovan ên her roj zêde dibin û xwestin heyeteke mafên mirovan bi îdareya têkildarî mijarê hevdîtinê pêk bîne.

Girtiyên li 2'yemîn Hejmara Tîpa F a Kiriklarê niha jî girtiyên li 1'emîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê bi riya parêzerên xwe têkildarî zordariyên li girtîgehê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku îdare û personelên girtîgehê ketine nav hewldanên kêfî.

### Nahêlin em bi kurdî biaxivin

Tê gotin ku ew nikarin di telefonê de mafê axatina kurdî ya 10 deqeyan bi kar bînin û mijarên din jî wisa rêz dikin: "Nerazîbûnên me yên demokratîk jî rastî cezayên dîsîplînê tên. Di dema hevdîtina vekirî de heke kesên mafên hevdîtina vekirî tune be, nahêlin hevdîtina girtî jî bikin. Dema hevdîtinê bê ku haya girtî û xizmên wan jê hebe tê guherandin. Bi awayekî fiîlî mafê hevdîtinê tê astengkirin. Bi awayekî kêfî girtiyan dereng derdixin hevdîtinê. Mafê 3 ziyaretvanên ne xizmên girtiyan tê astengkirin. Pirtûkên ji bo wan biryara berhevkirinê tune, bê sedema tên astengkirin û nadin hundir. Di dema lêgerînan de pêkanînên ku rûmeta mirovan dişikênin pêk tînin."



### Bang li ÎHD, ÇHD û TÎHV'ê

Girtiyan diyar kir ku ji Serdozgeriya Komarê randevu xwestine lê ev daxwaza wan bi cih nehatiye û wiha hate gotin: "Em dixwazin heyeteke ji ÎHD, ÇHD û TÎHV'ê pêk tê bi îdareya girtîgehê re hevdîtinê pêk bîne. Ku ji hevdîtinê encamek dernekeve em ê mafên xwe yên demokratîk pêk bînin. Divê îdareya girtîgehê di zûtirîn demê de dawiyê li pêkanînên kêfî bîne." Li girtîgehê ev demeke dirêj e nûçeyên têkildarî binpêkirinên mafên girtiyan di çapemeniyê de derdikevin. **ÎZMÎR / DÎHA**

## Dadgehên tirk zarok kirine hedef

Li Stenbolê 5 zarokên ku tevî daxuyaniya bi armanca şermezarkirina lêdana zarokên li Colemêrgê ku ji aliyê tîmê taybet ve pêk hatibû bûn, bi hinceta "Propagandaya rêxistinê kirine" li dozgeriyê îfade dan.

Li Bayramtepeya Başakşehîrê 5 zarokên bi navên Ş.T (12), Z.T (12), J.T (9), Y.A (13), M.O (13) ku bi hinceta tevlî çalakiya şermezarikirina êrîşa tîmê taybet a li hemberî zarokên li Colemêrgê bûne û "propagandaya rêxistinê kirine" li Serdozgeriya Komarê ya Kuçukçekmeceyê îfade dan dozger. Netîce Taşdemîr, Kamîle Koç, ku tê îdiakirin daxuyanî xwendine û Serokê Rêxistina DTP'ê yê Başakşehîrê Berat Anli û zarok piştî li midûriyeta polîsan nasnameyên wan hatin tespîtkirin ji bo îfadeyê derxistin dozgeriyê û paşê hatin berdan. Balkêş e ku tîmê ku bi awayekî hovane zarok nîvkûştî kiribû hê nehatiye girtin. **STENBOL / DÎHA**

## Li Çelê di teqînekê de 7 leşker mirin

Li çoltera gundê Gûzereşa bi ser navçeya Çelê ya Colemêrgê piştî teqîna ku di encamê de 6 leşker hatin kuştin û 8 leşker jî birîndar bûn. Piştre hate ragihandin ku ji kesên birîndar çawişekî pispor miriye.

Li gundê Gûzereşê di dema leşker derdiketin operasyonê teqîn pêk hatiye û di encama teqînê de 6 leşker hatin kuştin û 8 leşker jî birîndar bûne. Piştî teqînên ji kesên birîndar çawişekî pispor jî miriye. Piştî bûyerê bi piştgiriya hêzên hewayî operasyoneke berfireh hate destpêkirin. Hate ragihandin ku di çarçoveya operasyonê de li herêmê hin dever ji aliyê helîkopteran ve tên bombebarankirin. Li gorî agahiyan birîndar rakirine nexweşxaneyên Wan û Colemêrgê.

Cenazeyê 6 leşkerên bi navên Ziya Bener (çawişê pispor), Ozkan Dumlu, Denîz Demîrcî, Cafer Çelîk, Kemal Ozevin û Adîl Yildiz ji Şirnexê bi 3 helîkopteran birin bajarên wan. **COLEMÊRG / DÎHA**

## Li Patnosê gel bertek nîşanî polîsan da

**AGIRÎ**

Li navçeya Panosê bi boneya polîsê trafîkê neheqî û heqaret li hin welatiyan kiriye, gengeşî derket. Li gorî agahiyan li Bulvara Patnosê ya navçeyê polîsê tarfîkê yê bi navê S. bi hin welatiyan re nîqaş kir. Hate daxuyandin ku polîs di dema nîqaşan de heqaret li welatiyan kiriye û ev yek bûye sedema nîqaşan. Li ser vê yekê welatiyan jî nerazîbûn nîşan da û helwesta polîsî protesto kir. Ji ber zêdebûna nîqaşan rêveberên DTP'ê jî hatin cihê bûyerê. Li ser navbeynkariya DTP'yiyan gengeşiya bi polîsan re bi dawî bû.

## Li Herêma Medya tevgera hewayî

**AMED**

Balafirên şer ên Tirkiyeyê li başûre Kurdistanê li Herêma Medya tevgera hewayî pêk anîn. Balafirên şer ên Tirkiyeyê piştî ku li Çelê di encama teqînekê de 6 leşker winda kirin dest bi vê tevgerê kir. Di çarçoveya tevgera hewayî de herêma Basyan a Avaşînê hate bombebarankirin. Der barê kitekitên bombebaranê de ji herêmê agahî nehatin girtin.

## Li Stenbolê binçavkirin

**STENBOL**

Polîsên bi ser atolyeyeke tekstîlê ya li navçeya Gungorênê de girtin welatiyê bi navê Şenol Kadaci binçav kir. Li gorî agahiyan, polîsên midûryeta navçeyê bi ser atolyeya tekstîlê ya Nakiş a li taxa Sanayiyê ya navçeya Gungorenê de girtin. Di encama serdagirtinê de xebatkarê atolyeyê û endamê DTP'ê Şenol Kadaci hate binçavkirin. Kadaci birin Midûriyeta Polîsan a Stenbolê.

## Qereqol wek dadgehê ceza li kurdan dibire



Kesên wekî karkerên demsalî hatin navçeya Turgutluya Manîsayê, bi îdiaya agahiyên nasnameyên xwe nedane, ji aliyê qereqola cendirmeyan a navendê ve rastî 2 hezar û 500 TL cezayê pereyan hatin.

Karkerên demsalî yên ji bo di karên zeviyan de bixebitin ji bajarên herêmê hatin Navçeya Turgutluya Manîsayê, ji aliyekî ve rojê 12 saetan neçar dimînin di bin şertên ne bi tenduristî de bixebitin û ji aliyekî ve jî tevî hemû şertên zor ketine derdê parastina pereyê qezenc dikin. qereqola cendirmeyan a navendê ya Turgutluyê, bi hinceta karkerên demsalî yên li gundê Çapinarê ya girêdayî Turgutluyê dixebitin agahiyên nasnameyên xwe nedane qereqolê 2 hezar û 500 TL cezayê pereyan birî. Karkerên ku nasnameyên wan hatine desteserkirin nizanin çi bikin. Karkeran dan zanîn ku ceza ne hiqûqiye dê nedin.

### Wek dadgehê ceza li me birî

Ji karkerên demsalî Feyzullah Karaday ji bo karê tevrikê bike ji navçeya Dêrikê ya Mêrdînê hate gundê Çampinara Turgutluyê. Karaday da zanîn ku êvaran karger di bereqeyekê de dimînin, cendirmeyan avêt ser bereqeyê, ew derxistine der, heqaret li wan kirin û birin qereqolê. Karaday destnîşan kir ku wan ji bo nasnamyeyê agahî dane muxtar lê leşkerê payedar gotiye ji min re çi û li hin jime re 2 û 500, hin malbatan re 5 û li hin malbatan jî 15 hezar TL cezayê pereyan dibire.

### Ev ne tiştekî hiqûqî ye

Ji karkerên demsalî Kenan Turkan ê ji navçeya Hezo ya Êlihê hatiye jî, anî ziman ku ew rojê di navbera 15 - 20 TL'yan de pere qezenc dikin. Eger kar hebe, dema kar nebe em vî pereyî jî qezenc nakin. Wekî malbatê em heta dawiya demsala havînê dixebitin lê em 2 hezar TL'yan qezanc nakin. Lê qereqolek radibe 12 hezar û 500 TL ceza dibire.. Em dê vî pereyî ji ku derê bînin? Canê me jî bigirin ev qes pereyê me tuneye."

### Ev ceza encama neyartiyê ye

Hat gotin ku pêkanînek wiha li tu deverê cîhanê nayê dîtin. Em welatiyên vî welatî ne û bi xwêdana eniya xwe em pênc quruş pere qezenc dikin. Tu tiştek hiqûqî ji bo vî cezayê tuneye. Ev encama neyartiya li dijî kurda ye." **MANÎSA / DÎHA**

## ÎHD: Operasyon nahêle pirsgirêk çareser bibe

Şaxa ÎHD ya Sêrt'ê li ser gerîlayên ku di encama operasyonên ku li herema Sêrtê pek hatî jiyana xwe ji destdabûn û cenazeyên wan nedane malbatên wan raporek aşkera kir. Di raporê de hate gotin ku operasyon li ber çareseriya pirsgirêka kurd de astengî derdixe û hewceye operasyon werin rawestandin.

Şaxa ÎHD ya Sêrtê li ser gerîlayên ku di encama operasyonên ku li herêma Sêrtê pêk hatî û jiyana xwe ji destdabûn û cenazeyên wan nedane malbatên wan, bi daxuyaniyekê çapemeniyê re raporek aşkera kir. Seroka Şaxa ÎHD ya Sêrtê Vetha Aydin daxuyanî xwend. Aydin biryara bêçalakbûyîna KCK bibîrxist û got ku: "Ji 1'ê hezîranê re çend roj mane û operasyon bi zêdetir belav dibe û ev li ber çareseriya pirsgirêka kurd de astengiyeke. Niqaşên ku ji aliyê serokomar û rewşenbîr ve li ser pirsgirêkê tê kirin, rewşekî erênî derdixe holê. Lê operasyonên ku dom dikin li hemberi vê rewşê bê çareseri dixe rojevê."

### Ji bo aştiyê gavên ji dil û can divê

Aydin da zanîn ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd de gavên ji dil û can û mayînde werin avetin û wiha dom kir: "Berî her tiştî hewceye operasyon bi dawî bibin û agirbesteke dualî were ragihandin û destê aştiyê ku hatiyê direjkirin were girtin. Em ji bîr nekin ku polîtîkayên înkar û îmhayê şer mezintir dike. Çareserî bi bêdengkirina çekan derbasdibê."

Aydin bal kişand ser cenazeyên ku li herêma pevçûnê hatinê berdan û da zanîn ku ev kiryareke bêhuquqî ye. Aydin eşkere kir ku heta niha 20 cenazeyên gerîlayan di herêma pevçûnê hatiye berdan û nedanê malbatan wan û xwest cenazeyên gerîlayan bidin malbatan. **SÊRT**



www.arsivakurd.org

# Dadgehê ji KESK'ê re got 'rêxistina terorîst'

**Li hemberî konfederasyona KESK'ê di heman demê de li 5 bajaran bi hev re operasyonek hate lidarxistin. Di operasyonê de 34 kes hatin girtin. Dadgehê operasyona li dijî KESK'ê wekî operasyona li dijî 'rêxistina terorîst' bi nav kir**

**I NAVENDA NÛÇEYAN** - AMED

Bi biryara 10'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Îzmîrê, ji aliyê Fermandariya Cendirmeyan a Bajar a Îzmîrê ve li hemberî KESK'ê li Îzmîr, Enqere, Wan, Stenbol û Manîsayê operasyon hate destpêkirin. Hate zanîn ku hejmara kesên di çarçoveya operasyonê de hatin binçavkirin derket 34'an. Di daxuyaniyên têkildarî mijarê ji aliyê meqamên fermî ve hatin dayîn de, hate îdiakirin ku operasyon di encama taqîba teknîkî ya li ser îxbareke 6 meh berê ji Fermandariya Cendirmeyan re hatiye kirin de li hemberî Konfederasyona Kedê KESK'ê hatiye pêkanîn.

Polîsan duh bi ser Navenda Giştî ya KESK'ê de girt û li navendê lêgerîn pêk anî. Sekreterê Giştî ya Jinan a Egîtîm Sen'ê Gulçîn Îspîr û endamê 2'yemîn Şaxa Egîtîm Senê ya Enqereyê Lamî Ozgen di encama serdagirtina malên xwe de hatin binçavkirin. Her wiha Sekretera Jinan a KESK'ê Songul Morsumbul jî li Stenbolê hate binçavkirin. Polîsên Midûriyeta Polîsan a Enqereyê bi ser mala endama Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Yuksel Mutlu de girtin. Di serdagirtina di seatên serê sibê pêk hatî de Mutlu hate binçavkirin. Hate zanîn ku Mutlu di çarçoveya operasyona li hemberî KESK'ê de hatiye binçavkirin û dê bibin Îzmîrê.

**Li Wanê kesek hate binçavkirin**

Polîsên girêdayî Midûriyeta Polîsan a Wanê di saetên serê sibê de piştî avêtin ser mala endamê Şaxa Egîtîm Senê ya Wanê Hasan Umar. Di serdagirtinê de Umar hate binçavkirin. Her wiha polîs û leşkeran bi hev re piştre avêtin ser Şaxa Egîtîm Sen'ê ya Wanê. Piştî lêgerîna 2 saetan, polîs ji avahiya Egîtîm Sen'ê veqetiyan.

**Li Îzmîrê operasyona KESK'ê**

Di çarçoveya operasyona li hemberî KESK'ê de di ser mala Sekreterê Giştî yê KESK'ê yê berê Abdurrahman Daşdemîr de girt û Daşdemîr hate binçavkirin. Her wiha polîsan di ser 1'emîn û 2'yemîn şaxên Egîtîm Sen'ê yên Îzmîrê de girtin. Her wiha cendirmeyên ku avêtin ser mala endamê berê yê Egîtîm Senê Serokê BDP'a Îzmîrê Ahmet Demîroglu, dema di malê de tu kes nedîtin, derî şikandin û di malê de lêgerîn pêk anîn. Di çarçoveya operasyona ji aliyê Fermandariya Cendirmeyan a Îzmîrê ve li hemberî KESK'ê hate destpêkirin de 28 kes hatin binçavkirin. Di encama serdagirtinê de Sekreterê berê yê Giştî yê KESK'ê Abdurrahman Daşdemîr, Endamê MYK'ya SES'ê Yuksel Ozmen, Sekretera berê ya jinê ya Egîtîm Senê Elîf Akgul Ateş, endamên Egîtîm Senê Harun Gundeş, Mehmet Hanîfî Kurîş, Nergîz Acar, Selçuk Akpolat, Kemal Akkaya, Meryem Çagi, Alî Şîfahî, Şermîn Guneş, Murat Merîç, Mustafa Guçlu, Faysal Ceylan, Hasan Soysal, Haydar Demîr û Mahîr Çelîk hatin binçavkirin.





## KESK: Operasyon ji bo çavtirsandinê ye

Sekreterê Giştî yê KESK'ê Emîralî Şîmşek, diyar kir ku serdagirtina li hemberî sendîkaya wan pêk hatiye ji bo çavtirsandinê ye û xwest pêkanîna derhiqûqî zûtirî demê bê rawestandin. Lijneya Giştî ya Egîtîm Sen'ê li hemberî operasyona li dijî KESK'ê, endam û rêveberên sendîqeyê nerazîbûn nîşanda.

Sekreterê Giştî yê KESK'ê Emîralî Şîmşek ku di dema serdagirtina li hemberî Navenda Giştî pêk hat de li ber sendîkayê daxuyanî da, da zanîn li hemberî sendîkaya wan li gelek bajarên Tirkiyeyê di heman demê de operasyon hatiye destpêkirin û bi lêv kir ku kes hatine binçavkirin. Şîmşek, daxuyand ku Sekretera Jinan a Giştî ya KESK'ê Songul Morsunbul, Sekretera Jinê ya Egîtîm Senê Gulçîn Îspîr û Rêvebera Şaxa Numre 2 ya Egîtîm Sen a Enqereyê Lamî Ozgen hatine binçavkirin. Şîmşek, ji ber operasyona li hemberî sendîkaya wan pêk hatiye wekî operasyona "rêxistina terorê" tê nîşandan nerazîbûn nîşan da.

Şîmşek bang kir ku di zûtirîn demê de dawî li operasyonê bê anîn û hevalên wan ên hatine binçavkirin serbest bêne berdan. Parlamentera DTP'ê ya Şirnexê Sevahîr Bayindir û Parlamenterê ODP'ê Ufuk Uras çûn serdana navenda giştî ya konfederasyonê û nerazîbûna xwe ya li hemberî operasyonê anîn ziman.

**Ji Egîtîm Senê nerazîbûn**

Lijneya Giştî ya Navendî ya Egîtîm Sen'ê têkildarî operesyona li dijî Navenda Giştî ya KESK'ê û operasyona ku li 5 bajaran bi hevdemî pêkhatiye daxuyaniyek nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku Egîtîm Sen ne bi tenê ji bo mafên kedkarên perwerdehiyê tevdigere, di heman demê de ji bo demokratîkbûyîna Tirkiyeyê jî têkoşînê dide.

**'Zordariyeke faşîzan e'**

Serokê Giştî yê EMEP'ê serdagirtina KESK'ê û sendîqayên din şermezar kirin. Di daxuyaniya nivîskî de Tuzel, Serokwezîr R. Tayyîp Erdogan û Serokomar Abdullah Gul jî rexne kirin û daxuyand ku Erdogan çend roj berî niha pêkanînên li hemberî kêmaran wekî, "Faşîzmê" nirxandiye. **ENQERE / STENBOL**

## 'Zordariya li ser kurdan zêde dibe'

**LONDON**

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî rapora xwe ya salane weşand. Rêxistina Efûyê di rapora xwe de anî ziman ku li Tirkiyeyê zext û zordariyên li ser kurdan zêde bûne. Di raporê de hate destnîşankirin ku îşkence, muameleyên nemirovane û astengiyên li hemberî azadiya xweîfadekirinê didomin. Rêxistina Efûyê di daxuyaniya xwe de bal kişand ser rewşa kurdên li Sûriyeyê dijîn jî û diyar kir ku li Sûriyeyê jî kurd di bin zext û zordariyê de dijîn.

## Başûr dest bi îxracata petrolê kir

**HEWLÊR**

Herêma Federal a Kurdistanê dest bi îxracata petrolê kir. Beriya destpêkirina îxracata petrolê ya ku dê di 1'ê hezîranê de dest pê bike, pêr cerebeya ji bo neqilkirina petrolê pêk hat. Berdevkê Wezareta Petrolê ya Iraqê Asim Cîhad duh bi daxuyaniyekê diyar kir ku ji Başûr îxracata petrolê daye destpêkirin. Pispor tînin ziman ku di nava demeke din de rojê 100 hezar varîl, di nava demê de ev rêje dê bibe milyonek varîl.

## 'Binêre ava Firatê xwîn diherike'

**ÎZMÎR**

Rêxistinên civakî û partiyên siyasî bi slogana "Binêre ava Firatê xwîn diherike" li Îzmîrê 'Zîncîra Mirovan' pêk tînin. Rêxistinên li ser banga Navenda Giştî ya ÎHD'ê hatine cem hev ên wekî ÇHD, KESK, TTB, DTP, ODP, SDP, EMEP, Halkevlerî hatin cem hev Înîsiyatîfa Rastî û Edaletê ya Îzmîrê ava kirin. 19 saziyan bi armanca balkişandina ser kirinên Ergenekonê yên li rojhilatê Firatê di 30'ê gulanê de Zincîra Mirovan pêk tînin. Zincîra Mirovan dê di 30'ê gulanê de pêk bê.

# 'Ji bo çareseriyê divê çek bêdeng bibin'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, diyar kir, ji ber di encama teqîna li navçeya Çelê ya Colemêrgê de 6 leşkeran jiyana xwe ji dest daye û 8 leşker jî birîndarbûne gelek xemgîn in û daxuyand ku kesên çareseriya demokratîk dixwazin pêwîst e pêşiyê dest ji tetikan berdin. DTP'a Îdirê, bi meşeke girseyî pêkutiyên li hemberî DTP'ê şermezar kir û xwest ji bo biryara bêpevçûniyê ya KCK'ê bersiv bê dayîn.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, têkildarî teqîna li navçeya Çelê ku di encamê de 6 leşkeran jiyana xwe ji dest daye daxuyaniyeke nivîskî weşand. Turk, destnîşan kir ku ev demeke dirêj e li Tirkiyeyê êş tên kişandin û îro jî êşeke din li van zêde bûye û derbirî ku ji ber vê di nava xemgîniyeke mezin de ye. Turk, ji malbatên leşkerên jiyana xwe ji dest dane re sersaxî xwest û ji birîndaran re jî şifa xwest. Turk, di daxuyaniya xwe de got ku ew tu carê pêkanînên ku dibin sedema jidestdayîna jiyana mirovan qebûl nakin û ev tişt gotin: "Ev bi hefteyan e ligel hemû bangên me operasyonên leşkerî bênavber didomin. Tabî li hemberî operasyonan çalakî jî didomin. Em li vir bi zelalî didin zanîn; kesên ku çareseriya demokratîk dixwazin pêwîst e pêşiyê dest ji tetikan berdin. Ancax em dikarin bi vî awayî rê ji çareseriya siyasî re vekin. Heta ku em mirinan nedin rawestandin em nikarin tu çareseriyên demokratîk biafirînin. Em cardin dibêjin ji bo dawîanîna van êşan peywir li ser milê siyasetê ye."

DTP'a Îdirê, têkildarî pêkutiyên li dijî DTP'ê û biryara bêpevçûniyê ya KCK'ê daxuyaniyeke girseyî da. Zêdetirî hezar kesên li ber avahiya DTP'ê hatin cem hev, li ber def û zirneyan govend gerandin. Wakîlê Şaredarê Îdirê Ahmet Guven, Serokê Meclîsa Giştî ya Bajar Agît Kaya endamên meclîsa giştî û meclîsa şaredariyê jî tevî meşê bûn. Serokê DTP'a Bajar Ahmet Barbaros, piştî meşa li ber avahiya DTP'ê ya bajar bi dawî bû daxuyanî da. Barbaros, destnîşan kir ku piştî demek kurd dê dema biryara bêpevçûniyê ya ji aliyê KCK'ê ve heta 1'ê hezîranê hatiye îlankirin bi dawî bibe û bang li hemû kesan kir ku ji bo çareseriya pirsgirêkê bihîstiyarî nêzîk bibin. **ENQERE / ÎDIR**

## 'Heta 1'ê hezîranê gav bavêjin'

Li Edeneyê rêxistinên civakî yên sivîl û partiyên siyasî bang li hikûmetê kirin û xwestin heta 1'ê hezîranê bersivê bidin biryara KCK'ê ya bêpevçûniyê.

***Berdevkê Demê yê Platforma Şaxên KESK'ê ya Edeneyê Kahraman Oguz:*** Heta ku pirsgirêka kurd neyê çereserkirin pirsgirêkên aborî jî ji holê ranabin. Divê ev pirsgirêk bi rêgezên demokratîk bê çareserkirin. Serokomar Gul dibêje 'Dê tiştên baş çêbin'. Eger tê xwestin tiştên baş pêk bên divê bersiv ji biryara KCK'ê re bê dayîn û gaveke erênî bê avêtin.

***Seroka EMEP'a Edeneyê Prz. Sevîl Araci:*** Ji bo çareseriyê pêwîst e dewlet gavan bavêje. Ligel wê ez di wê baweriyê de me eger KCK jî vê pêvajoyê dirêj bike dê baş bibe. Divê hemû derdor bên cem hev û ji bo çareseriyê riyên demokratîk nîqaş bikin. Ji bo çereseriyê muxatab jî DTP ye, divê bi DTP'ê re diyalog bên destpêkirin.

***Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Edeneyê Ethem Açikalin:*** Beriya niha jî agirbest hatin îlankirin lê ev pêvajo baş nehatin nirxandin û wê demê dewletê ji dêvla çareseriyê ve giranî da operasyonan. Ev jî bûye sedema gelek eşan. Açikalin, di axaftina xwe de da zanîn eger ji pêvajoya niha re jî bersiveke baş neyê dayîn, mixabin dê ev firsend jî ji dest here. Ji bo ku pêvajo baş bidome, pêşiyê pêwîst e çek bên rawestandin û riyên diyalogê bên vekirin. Bila hikûmet bi lez gavan bavêşe.

***Midûrê Giştî yê Nivîsaran ê Rojnameya Parêzer û Têkoşîna Karkeran Şîar Rişvanoglu:*** Ez bawer nakim ku hikûmet ji bo çareseriyê gavekê bavêje. Ew ê di polîtîkayên tunekirin û tunehesibandinê de heta dawiyê israr bikin. Ji bo çareseriyê bi qasî DTP'ê divê hêzên muxalif ên din jî bikevin nava hewldanan. Di vê mijarê de peywir dikeve ser milê hemû kesî. **EDENE / DÎHA**

# Ji Amedê banga ji bo agirbesta dualî

Li Amedê 72 rêxistinên sivîl ên demokratîk ku daxuyaniyeke hevpar dan, diyar kirin ku operasyonên tên meşandin pêvajoya agirbestê têk dibin û pêşniyara ku PKK biryara xwe ya agirbestê ya heta 1'ê hezîranê dirêj bike, kirin.

Li Amedê sendîkayên karkeran, memuran, saziyên aborî, saziyên jinan, saziyên tenduristiyê û saziyên mafên mirovan jî di nav de 72 rêxistinên sivîl ên civakî li Cemiyeta Rojnamevanên Başûrêrojhilat hatin cem hev û têkildarî pirsgirêka kurd civîneke hevpar pêk anîn. Serokê Baroya Amedê Mehmet Emîn Aktar ku li ser navê saziyan daxuyanî da, diyar kir ku operasyona li hemberî KESK'ê hatiye destpêkirin û 6 leşkerên li Çelê jiyana xwe ji dest dan girîngiya daxuyaniya didin derdixe holê. Aktar, destnîşan kir ku di demeke hêviyên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd zêde bûne de derbas dibin û wiha pê de çû: "Piştî gotinên Birêz Serokomar Abdullah Gul ên têkildarî pirsgirêka kurd pêvajoya nîqaşeke erênî dest pê kir. Bi esasî vî bayê aştiyê hin hêvî jî bi xwe re derxistin pêş. Divê hemû kesên xwedî berpirsyar û bihîstiyar piştgiriyê bidin vê pêvajoyê."



**'Divê agirbest bê dirêjkirin'**

Aktar, da zanîn ku pêwîst e wekî demên borî tu kes ji bo astengkirina vê pêvajoyê nekeve nava hewldanan û wiha pê de çû: "Di vê demê de zêdebûna operasyonan dê tu fêdeyê nede pêvajoya aştiyê. Em dixwazin bêjin ku operasyonên tên meşandin dê berdewama pêvajoya aştiyê bixe talûkê. PKK jî yek ji aliyên ku divê piştgiriyê bide vê pêvajoyê ye. Di vê çarçoveyê de em hêvî dikin biryara bêpevçûnê ya heta 1'ê hezîranê bê dirêjkirin. Divê saziyên dewletê, hikûmet û partiyên muxalefetê bi hev re ji bo vê pêvajoyê baweriyê bidin û gavên bibiryar bavêjin. Aktar, daxuyand ku wekî rêxistinên civakî yên di binê belavokê de îmzeya wan heye dê vê pêvajoyê bişopînin û bang li hemû kesan kir ku bi hestên berpirsiyariyê tev bigerin. Aktar, wiha got: "Bila zimanê aştî û çareseriyê serdest bibe, çek bêdeng bibin, mirov biaxivin û êdî zarokên vî welatî jiyana xwe ji dest nedin." **AMED / DÎHA**

www.arsivakurd.org



Erxewan

Arjen Arî
arjenari99@yahoo.com

# Di navbera du 'reş'an de 24 deq!

Kî çi dibêje bila bibêje, bi min helbest ne qasekî; tibabekî bîr e!

Ku ne bîr be, helbest dê çawa karibe duh bîne îro, îro bi sibe, sibe bi siberojê ve ke…

Helbesta ku ji hêlekê ve ji bîra xemên rojane dertê û dixwaze bi xwepirkirinê xwe bi ser hev de; ji hêla din ve di erdnîgariya raboriya civakî de bi lêgerîneke takekesî li 'bîrên xitîmî' digere, da xitimandinê bi serê darikê peyvê vepixêre, û vepixirandinê deq bi deq derxê ber tava ravekirinê…

Weke deqên di dema zarokatiyê de, di hewldana dema vepixirandinê birê de, helbestkar ji nava vepixirandinan 'deqine vepixîner' hildibijêre, da bîr, bîra qedera hevbeş weke 'Bîra Qederê' bi ser serê xwediyê xwe de nekumişe.

Gelek bîr hatine xitimandin, û ew bîrên bi destê xitimîneran xitimandî, bîrê serê qoqê qewmên kitm in.

Yek ji qesas-sedemên kitmî û jiholêrabûna qewman jî bêbîrî û jibîrkirî ye.

Helbestkar Lal Laleş, bi xebate xwe ya dawî 'Deqên Qesas' peyvê dike bêra vepexirtina bîra me, û her deq'î, her deqê bîra jibîrbûyî' dixe dewla hişê me, û dike ku serê me geh li vî dîwarî bikeve, geh li wî dîwarî .

Ya seyr ew e ku her du dîwar, bi qasî ku dikarin bibin ser û binê bîra deqan, dikarin veke du dîwarên ku li hemû deqan hatibin hev û nehêlin ku ne bikaribin ji bîrê derkevin, ne jî di bînê bîrê de biqeliqin, bilivin.

Pêşiyên xweşbêj çendî gotibin 'Me bext neda bi text' jî; Lal Laleş ji nava 24 'Deqên Qesas' 22 Deqan di navbera deqa bext û deqa text de bi cih dike, û piştî Deqa Bextê Reş, me dadihêje binê bîrê:

Med ji hespê hezkira wan hez kirin

Wan em ji zêrzemîna zêmara me kirin

Hespa Şê binefşê

Biborîne!

*Me bi destê xwe hûn xistin ber erebeya şer**

Û şer hê jî didome, hem jî bi hemû dijwariye xwe.

Û ka kî zane ku dê çeng şox û şepal têkevin ber erebeya şer?

Û şer hê jî mezintirîn bîr û birîna me û ya dijminê me ye!

Lal Lalêşê ku di vê xebata xwe de berê xwe dayê hêsan-vebirîna deqên birîna bîrê; di birîna bîrê de ji bilî Deqa Kawa; bi yê El Cizîrî, Xanî, Feqî re yê Celadet Bedirxan û birek hêjayên din, û zeman û jiyana rasteqîn a ku em niha tê de ne jî weke deq hildibijêre:

*Komeke ciwan, komek kal û çend sûtal*

*Li ber bedenê li ser kursiyan*

*Li lavlavkên bi sûran ve radiperilike dinihêrin*

*Li nik wan şeqşeqa tewla*

*Hîrêhîra hespên sedrencê*

*Ava sûsê memikê qîzê***

Di nava deqên bijarte de, deqa jor deqek wisa ye, ku li cawê jiyînê vedaye, û jiyan debixandiye.

Li vir, deq xwe ji serwerdeqiyê vediguherin deqeke li heyatê ketî.

Li gel hemû rengên heyî, rengin hene ku ji hemarengiyê wirvetir; li hev vedidin, hevdu didedibixînin:

Bî man, beyar man ew erdên adanî hê jî beyar in

Bavê min dibêje lawo! Ger îsal rehma xwedê hebe

*Emê birakujiyê bizar bikin*

*Li dû xubarajotinên genim****

Di bendedeqinan de Lal li gelek cihan bi yek ristê hizirkûriyek, pirwatetiyek, weneyekî berfireh li ber çavan raxistiye:

Gava min her tiştê xwe winda kir hingê her tiştê min çêbû ****

Piştî evqas tiştên windakirî û çêbûnê çê ji kîsî Mîr wisa bibêje jî, Lal sûretê axeke bîrbir wisa diwênîne:

*Helbestvên helbesta xwe avêt nav şerê kirêt*

*Aştî saz bû!*

*Ax ji kêfan kerr bû*

*Di destê axê de risteke helbestvên******

Deqên Qesas, Helbest, Lal Laleş, Wş. Lîs 2009-05-28

** Deqa Med*

*** Deqê sedrencê*

**** Deqa cawbira kujer*

***** Deqa Celadet*

****** Deqa cawbira kujer*

## Rûbaiyên baranê

*-I-*
*gava ku bistrê*
*dûrketinên zarokatiya*
*min*
*belê tu tê bîra min*
*û çemên ji me pir dûr*

*gava ku bilorîne*
*hesretên jinbûyîna min*
*bê şik tu tê bîra min*
*û sonda li ser genim*

*gava ku bikene*
*nîqaşên emrê min*
*bê guman tu tê bîra min*
*û gulên qerexa lêvên min*

*-II-*
*diricifim*
*di nav ayînên qurbanê de*
*diricifim û tenê me*
*di nav dengên ne diyar*
*û bajarên windayî de*
*tenê me û bendemayî…*
*ax meya destê dildaran*
*stêrkên leyla yên*
*bêzaran*
*helbestên devê*
*munzeviyan*
*binêr navê te dikim*
*nivişta stûyê xwe*
*û xwe tesdîq dikim*
*di bin baranê firmiskan*
*de*
*bi tirsa xwe*
*bi ricifandina xwe*
*û bi tenêbûna xwe…*

**ROJBÎN PERÎŞAN**





balekani@hotmail.com
Îkram BALEKANÎ

# Ka Selamo?

Ez bawer im piraniya we Selamo nas dike. Ew wekî Selamo Teşqele jî tê naskirin. Her çend ku gelek caran di çapemeniyê de wekî Şanoger Selamo, Stand-Up'çî Selamo tê binavkirin, lê piraniya we bi Teşqele wî nas dikin.

Ew hem bi xwe teşqeleyan dike û hem jî teşqeleciyan derdixe holê. Dibe ku hûn bawer nakin, lê tenê navê wî têrê dike ku teşqeleyan derxe holê.

Ez ne şaş bim, we dîtiye yan jî bihîstiye ku hefteya derbasbûyî nûçeyek der heqê Selamo de hate weşandin. Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DIHA), Radiyoya Dengê Mezopotamya, rojnameya Azadiya Welat û rojnameya Ozgur Polîtika jî ew nûçe weşandibû.

O.Polîtîkayê hem bi zimanê tirkî û hem jî bi kurdî nûçe weşandibû. (Yên ku ez rastî wan hatim, ev bûn, dibe ku hûn beşên din jî weşandibe, lê min nedît.

Ji bilî hin malperên lokal… )

Ya herî balkêş jî nûçeya O. Polîtikayê bû.

Di beşa tirkî de digotin, Selamo rakirin Nexweşxaneyê. Lê di beşa kurdî ya rojnameyê de li ser wêneyê wî nivîsîbûn: "Kirîza dil derbas kir"…

Jixwe di serî de sernavê wan şaş e, lê ev ne meseleya vê carê ye. Meseleya vê carê ev e ku Selamo bi nexweşiya xwe kêmasiyeke me ya mezin derxiste holê.

Di warê rojnamegeriyê de hêjî kêmasiyên me yên mezin hene. Dibe ku ev yek tenê mînakek biçûk be. Em di her warê jiyanê de bi vî rengî tevdigerin.

Em baş û xweş dest pê dikin û paşê dewama wê nayînin û disekinin.

Di nûçeyê de dihate gotin ku Şanogerê kurd Selamo ji ber nexweşiya dil rakirine nexweşxaneyê. Îca ev bû 2 hefte ku kes behsa wî nake. Kes nabêje ka çi hate serê Selamo. Gelo Xwede nekirî Selamo mir, yan jî niha rewşa wî baş e yan na?

Wê kengê ji nexweşxaneyê derkeve?

Gelo derketiye û em nizanin yan jî naxwaze derkeve? Belkî dixwaze derkeve lê diktor wî bernadin? Dibe ku derxistinbin jî haya me jê tunebe. Yan jî teşqele anîne serê diktoran an jî diktoran teşqele anîne serê wî.

Gelek pirsên din. Heyran ku nexweşiya Selamo ne hêjayî nûçeyê be, mirov di destpêkê de nûçeyê çênake, na, ger dibe nûçe û mirov çêdike, lewre mirov li hemberî xwxendevan, guhdar û temaşevanên xwe berpirsiyar e. Divê nûçe ku hate weşandin, bê şopandin û dewama wê bê anîn.

Gelo Selamo li ku ye? Ez li Selamo digerim. Ka Selmo!

Di vir de berpirsiyariya yekem dikeve ser milê Ajansa Nûçeyan a Firatê (ANF), piştî ajansê berpirsiyarî ya rojnameya Ozgur Polîtîkayê ye.

Di wir de jî berpirsiyarî ya beşa kurdî ye û di beşa kurdî de jî berpirsiyarî ya nivîskarê Rojnameya Azadiya Welat û Ezîz Ogur e.

(Heyran dîsa min bela xwe li Ezîz Ogur da, Xwedê bi xêr bike… ) Ji ber ku ez texmîn dikim nûçe ya wî be lewre pêwîst bû bişopanda…

Lê bila dilê we rihet be, ez hêj nemirine, ez bi dû şopa Selamo ketim û wekî prensîpa Şûnpê, ez li şûna pê wî geriyam.

Min Selamo li bajarê Solîngena Almanyayê dît.

Li ber çemê Solîngenê "spazieren gehen" dikir. (Yanî pêgermok digerand.

Ango pê xwe germ dikir. Bi kurdiya şaş, volta diavêt.

Yanî digeriya. Ez rastî wî hatim min dît ku ji bo komek alman semînerê dide û behsa giya û pincar dike.

Li derdora çem hin pincar dîtibû û nîşanî komê dida. Bê derew tenê dengek hate min ku digot:

"Das ist Tirşok" Yanî ev Tirşok e. Îca ez nizanim henekên xwe bi wan dikir, yan jî navê Tirşokê bi almanî nedizanî.

Welhasil em bêne ser mijara xwe.

Ne hewce ye em wekî nûçegehanan meselê mezin bikim û agahiyên xwe bispêrin diktoran, hema min bi çavên serê xwe dît ku rewşa Selamo maşellah Xwedê ji nezerê biparêze, ji berê baştir bû.

Hêvîdar im ku rewşa Selamo ji me û ji çapemeniya me re bibe dersek baş da ku dema em karekî dikin em bibin serî û bigihîjînin encamê.

HAWARA EYŞO


DIAYÊN EYŞO




ROJEVA EYŞO Û REMO




TU HÊZ NIKARE PÊŞIYA BAWERIYÊ BIGIRE



BÊ ŞÎROVE



# Reng û awazên kurdî coşand




## Panel veguherî çalakiya prostestoyê

Di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de panela bi navê 'Jin Namûs û Azadî' ji ber binçavkirina sekretera Jinan a KESK'ê Songul Morsumbul veguherî çalakiya protestoyê. Parlamentera Êlihê Ayla Akat Ata, diyar kir ku jinên kurd bi îdeolojiya rizgariyê ji tevgera jinên tirk re bûn pêşeng û dê bi wê îdeolojiyê têkoşîna xwe bidomînin.



Beşdarên panelê bal kişandin ser binçavkirina Songul Morsumbul û gotin ku êdî gotineke wan nemaye û panelê pêk naynin. Nivîskara rojnemeya Gunlukê Yuksel Genç, diyar kir ku Morsumbul têkoşereke azadiya jinan e û wiha axaftina xwe dom kir: "Kesên ku rastiya azadî, namûs û jinê nîqaş dikin yek bi yek tên girtin. Em panela xwe vediguherînin çalakiya protestoyê."

**Di çarçoveya Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de hunermend Ayfer Duzdaş û Mehmet Akbaş derketin ser dikê û stranên xwe bi hemû zaravayên kurdî yên wekî kurmancî, zazakî, soranî û hewremanî strîn**

Di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de bernameya danasîna mîhrîcanê û konsera ku hunermend Ayfer Duzdaş û Mehmet Akbaş beşdar bûn li Şanogeha Anfî ya Sumer Parkê pêk hat. Konsera ku pêşkêşvaniya wê şanoger Kemal Ulusoy dikir di televîzyonan de zindî hat dayîn. Ji ber eleqeyê gelek kes li ser piyan man û cihê rûniştinê nedîtin.

Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek axaftinek kir û anî ziman ku 9 sal in bi coşeke mezin mîhrîcana Amedê li dar dixin û wiha pê de çû: "Ne 9 sal 99 salan jî ev meş dê bidome." Alî Şîmşek bi lêv kir ku dema mirov li dîrokê dinêre cihê ku mîhrîcan lê derketiye Amed e û 9 sal in li hemberî hemû rewşên awarte dîsa jî mîhrîcanê pêk tînin û ji bo hemû kesên ku di mîhrîcanan de keda wan derbas bûye spasiyên xwe pêşkêş kir.

Şîmşek li ser girîngiya mîhrîcana îsal sekinî û wiha got: "Bi salan e li ser van axan xwîn dirije û rondikên dayikan kêm nabin. Em di wê baweriyê de ne ji bo aştî pêk bê divê êdî xwîn nerije. Ji ber vê yekê em di serî de ciwanên me û hemû gelê kurd vedixwînin meşa aştiyê ku dê 30'ê gulanê pêk bê. Em ê li wir daxwazên xwe bi sekn û hêzeke mezin bînin ziman."

**Li ser dikekê de hemû zaravayên kurdî**

Piştî nîşandina sînevîzyona ku ji mîhrîcanê destpêkê heta îro hat nîşandan hunermendê kurd Mehmet Akbay derket ser dikê. Mehmet Akbaş stranên kurdên Tirkiye, Îran, Ermenistan, Sûriye û Iraqê ji bo temaşevanan pêşkêş kir. Hunermend bi hemû zaravayên kurdî yên wekî; kurmancî, zazakî, soranî û hewremanî stra. Performansa hunermend ji aliyê gel ve gelekî hate ecibandin.

Piştî hunermend Mehmet Akbaş, Ayfer Duzdaş derket ser dikê. Her wiha Ayfer Duzdaş jî wekî Mehmet Akbaş bi hemû zaravayên kurdî yên wekî, kurmancî, zazakî, hewremanî, soranî stra. Girseyê ji ber stranên Ayfer Duzdaş govend girt û strana Ayfer Duzdaş ya 'Sallana Sallana' bi hev re gotin. Di bernameya mîhrîcanê ya îro de çalakiyên hunerê yên cur bi cur cih digirin. **AMED**

## Kuştineke bêxwîn: *Baholek û du ziman*

**ERTÛŞ BERÇELAN**

Carek ji caran rehmet li dê û bavê guhdaran. Li dahmenên Çiyayê Qerejdaxê gundek hebûye. Dibe ku cihekî din be jî. Ji xwe ne pir girîng e. Ku çîrok aşîna be, celad heman be, ma cihê gorê pir girîng e gelo?

Lê ne hatina mamoste ya gund li gorî herikîna mecraya jiyanê ye û ne jî kirinên wî. Dibe mamoste nizane dê her rojê hestên wekî kulîlkên li dahmenên Çiyayê Qerejdaxê di dilê zarokan de vebûn yek bi yek bikuje. Dibe nizane ku dê her rojê têkiliyek di malzaroka dayikê de bi zarok re çêbûyî bi kêra 'qedexetiyê' bibire. Dibe nizane ku dê bi her gotineke 'Bi kurdî neaxive' bi hezaran pirsên zarok tu wateyê nadin afirîne. Dibe nizane dê piştî her pirseke kirî bi kena xwe jî tirseke cehnemî bixe dilê zarokan. Dibe ku nizane mudaxeleyî rastiya jiyanê dike û xwezayê ji mecraya wê derdixe. Dibe ku nizane ew qatilek nahêle di dema kuştinê de xwîn jî ji mirovan biherike... Lê nezanîna wî kujeriya wî naguherîne. Pîrozweriya mamosteyan demeke dirêj bû li vî welatî bûbû kujeriya kuştinên bêxwîn. Lê fêde nebû.. Ji ber ku ew zarok bûn.. ne mecala lidijderketinê û ne jî derfeta qîrînê hebû..

Belê em behsa belgefîlmeke bi navê "Baholek û Du Ziman" dikin. Di belgefîlmê de serpêhatiya mamosteyê ji Denîzliyê yê bi navê Emre Aydin û zarokên gundekî kurdan tê vegotin. Mamoste di nav derfetan de û bêyî kesek mudaxeleyî jiyana wî ya xwezayî bike mezin bûye. Wekî ku biçe cihekî mîna cihê lê mezin bûyî derketiye rê. Baholê xwe bi kincan dagirtiye tê gund. Pêşiyê bi tunebûna avê bi bêderfetiya gund û herêmê re rû bi rû dimîne. Piştre tunebûna ceyranê, qutbûna ragihandinê û bêderfetiyên din. Lê mamoste pes nake... Karê wî pir e. Zarokên bi zimanê zikmakî diaxivin li vî gundî hene. Her çiqas di belgefîlmê de mamoste vê yekê nizane jî muqtedîrên çarenûsa zarokên kurdan dinivîsin zû de wezîfeya wî kifş kirine.

Ziman.... Belê ziman.. Dîwarê kelehên berxwedanê.. kevnareyê nemir... mîrateya hezaran salan.. boxçika keda bav û kalan. Mijara belgefîlmê jî ji xwe li ser vê rastiyê ye. Di belgefîlmê de diyalog an jî bi gotineke din a rastir monologên di navbera mamoste Emre Aydin, Rojda û Zilkîf de du hêmanên girîng radixin ber çavan. Dibe bi awayekî xwezayî jî derketibe holê lê bi riya awirên Rojdayê şikandina îradeya zarokên kurdan û bi riya Zilkîf jî zelalî, bedewî û mudaxelekirina rastiya zarokên kurd tê nîşandan.

**Vegotinek bi reseniya ziman**

Aliyek belgefîlmê ya balê dikişîne jî reseniya vegotinê ye. Têkiliya di navbera mamoste û xwendekaran de, bandora ziman a li ser jiyan, famkirin û hîskirinê bi zelalî radixe ber çavan. Pirsên Mamoste Emre yên bêbersiv wekî tîrek li nava dilê zarokan kan û dilê mirov ketî radiwestin. Mamosteyê tirk bi pêbaweriya xwe ji xwe li ser zarokan bandorek mezin dike û desthilatdarî di parvekirina mekan dest pê dike. Mamoste ji bikar anîna tirkî bawer e. Ji bo wî îhtîmala neaxaftina tirkî tune ye. Zimanek din mijara nîqaşê jî nîne. Ji bo wî hebe tune be tirkî ye. Di vî warî de pêşiyê bi psîkolojiyek normal dixwaze dest bi dersê bike. Lê her tişt wisa hêsan nabe. Ji ber ku têkiliyek hevdengî li holê tune ye. Mamoste dema dest bi pirsan dike zarokên yekem car ev ziman bihîstîn, ker û lal dibe. Ji bo wan coşa destpêkirina perwerdehiyê û hînbûna tiştên nû li cihekê tirsa mamoste dikeve dilê wan. Ev yek ji xwe di serî de armanca perwerdehî û zanistê ji holê radike.

Mamoste dest bi gotina dersê dike. Bêyî psîkolojiya zarokên wî fan nakin bifikire. Helwesta desthilatariyê di şexsê mamoste de jî di van pirsan de derdikeve holê. Zarokê dibistanê yê herî biçûk ê diçe sinifa yekemîn Zilkîf li hemberî pirsên mamoste bi rûyek xemgîn û masûm hişk dibe. Wekî zarokek bêmejî, bi rûyek bêwate li mamoste dinêre. Di belgefîlma İki Dil Bir Bavul de çewisandin, şikandin û têkbirina psîkolojî û baweriya zarokan bi gelek mînakên wiha tê dubarekirin.

**Çîroka Zilfî çîroka min e jî**

Me got ya çîrok aşîna ye. Çîroka Zilkîf û Rojdayê zarokatiya min di ber çavên min re derbas kirin. Ez bawerim ku hemû kurdên li vê belgefîlmê temaşe bikin jî dê xwedî li heman çîrokê derkevin. Di hestên Zilkîf ên tenik de, herkese dê hestên xwe yên li hemberî dengê mamoste yên tev li hev cardin bijî. Dê cardin wê tirs, xemgînî û aloziyê bijî. Dê biçe çanteyê Zilkîf bide pişta xwe, pênûsê Zilkîf bigire destê xwe. Her wiha mirov zilma qedexekirina zimanê zikmakî ya di diyalogên di navbera mamoste Emre û Rojdayê de jî baştir fam dike. Fîlm di warê qedexeya ziman de gelek tiştan tîne ziman. Belgefîlm dê di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de roja şemiyê (sibê) bê nîşan dan. Ger ku hûn dixwazin êşa ziman a li ser zarokan hîn bibin û rojên xwe yên borî bi bîr bînin vê fîlmê temaşe bikin. Destê hemû kesên ked dane vê belgefîlmê sax bin.

***Kunyeya Fîlmê:***
***Film: Du Ziman û Baholek***
***Derhêner: Orhan Eskîkoy, Ozgur Dogan***
***Dem: 81 deqe, Ziman: Tirkî kurdî 2008***





ZEYNEP KATAR (ARJÎN CEM)

# Bîranîn

*Berfîna çiyayên serhildêr, em dizanin niha tu li asîmanan bi stêrkan re yî!*
*Binêre asîman hê jî şîn e û çiyayên ku te ji bo wan xwe feda kirî wekî te maqûl û serbilind in!*
*Hemû stran te vedibêjin, êş û janan ji bîr dikin.*
*Me bêriya kena te kiriye!*

*Di yekemîn salvegera koça te ya dawî de, em te û hemû şervanên azadiyê bi bîr tînin!*

**Hevalên wê; Nadir, Tuncay, Salih, Rukiye, Mesut, Mazlum, Kamuran, Îsmaîl, Mukaddes**

www.arsivakurdi.org

# 'Divê firsend baş bê nirxandin'

## Li Geverê dayikên zarokên xwe di pevçûnan de ji dest dane, bang li hikûmeta AKP'ê kirin ku bersiv bide biryara bêpevçûniyê. Dayikan xwest ku ji bo aştiya mayînde hin gav bên avêtin

Dayikên zarokên wan di pevçûnan de jiyana xwe ji dest dane, bang li hikûmet û rayedarên dewletê kirin ku bersivê bidin biryara KCK'ê ya bêpevçûniyê. Dayikan xwest ku êdî xwîn nerije.

Naciye Îkeya dayika Fermandarê HPG'ê Alî Îhsan Îke ku di 22'yê gulanê de li Licê jiyana xwe ji dest dabû, diyar kir ku tu êş wekî, êşa kezebê dayikan naşewitîne û xwest ku êdî xwîn bisekine. Îke, wiha got: "PKK'ê heta 1'ê hezîranê biryara bêpevçuniyê girt. Ev tê wateya rawestandina şer lê dîsa cenazeyên zarokên me hatin. Ma ne bes e ev qas xwîn? Bila êdî ev şer biqede." Îke, bang li Serokwezîr jî kir û ev tişt gotin: "Tu misilmanekî çawa yî ku ji mirinê zewq digirî? Ma tu qet nayê rehmê? Min kurê xwe ji dest da. Ez naxwazim tu dayik vê êşê bikişîne. Bila bersiv ji birayara bêpevçûniyê re bê dayîn."



Jina bi navê Reyhan Yaşar ku kurê xwe di sala 1994'an de di pevçûnekê de ji dest daye jî bi lêv kir ku hê jî zarokên wan tên kuştin û got ku divê êdî dewlet dest ji siyaseta xwîne ber de. Dayika bi navê Hanîfe Arlan ku kurekî xwe ji dest daye û kurekî wê jî di girtîgehê de ye ev tişt gotin: "Êdî cîhan jî dibîne ka kî di şer de israr dike. Kurd destê aştiyê dirêj dikin ew bi şer û operasyonan bersivê didin. Ev tu çareseriyê pêk nayne. Bila ji bo çareseriyê gav bên avêtin."

Dayika bi navê Sîmanperî Bartin, ku kurê wê Îslam Bartin di dema çalakiyên şermezarkirina bûyerên Şemzînanê de jiyana xwe ji dest daye jî, anî ziman ku kurê wê ji ber ku aştî xwestiye hatiye kuştin û got bila êdî tu kes jiyana xwe ji dest nede. Bartin, bang li Serokwezîr Erdogan jî kir û xwest ji bo aştiyê tevbigere. Reyhan Bozkurt, ku kurê wê di sala 1997'an de di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest daye jî anî ziman ku biryara KCK'ê firsendeke girîng e û xwest ev firsend baş bê nirxandin. **COLEMÊRG**

## Operasyon û girtin didomin

Meclîsa Jinan a DTP'ê ya Stenbolê têkildarî mîtînga di 31'ê gulanê de li Amedê pêk tê, li avahiya DTP'ê ya Bajar daxuyaniyek da çapemeniyê. Endama Meclîsa Jinan a DTP'ê ya Stenbolê Songul Ercan bal kişand ser nîqaşên pirsgirêka kurd û wiha got: "Ev nîqaş asta pirsgirêk hatiyê nîşan didin. Lê her çiqas gotinên Gul ên wekî 'dê tiştên baş çêbin' di çapemeniyê de bên nîqaş kirin jî li gorî me tiştên baş niha çênabin. Ji ber ku hêj operasyon didomin û pevçûn berdewam dikin." Ercan diyar kir ku ji ber vê yekê dê daxwazên aştiyê bilind bikin û gelek saziyên jinan re li Amedê di 31'ê bi navê 'Lihevhatina Jinan' em tên cem hev. Di mitîngê de em dê daxwazên aştiyê bînin ziman û bi forumekê jî helwesta jinan a derbarê mijarê de bidin nîqaş kirin." Ercan diyar kir ku dê di 29'ê gulanê de seat di 19.30'an li ber avahiya TRT'ê ya li Tarlabaşi jinan ber bi Amedê ve rêwî bikin.




# Dê deng û hêz li Amedê bibin yek

Jinên ji derdorên cuda yên wekê Stenbolê û Yekîtiya Platforma Jinan a Enqereyê jî dê piştgiriyê bidin mîtînga jinan ya dê ji aliyê Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) ve di 31'ê gulanê de li Amedê bê lidarxistin.

Jinan anî ziman dê bi DOKH'ê re di nava piştgiriyê de bin û diyar kirin ku di mîtîngê de dê daxwazên xwe yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û berdana endamên DOKH'ê yên girtî bînin ziman. Jinên enqereyî û stenbolî ji bo piştgiriyê tevî mîtîngê bibin dê di 30'ê gulanê de ji Stenbol û Enqereyê ber bi Amedê ve derkevin rê.

### Li Amedê dengê xwe dikin yek

Endama Halkevî Dîlşad Aktaş bal kişand ku daxwazên aştiyê yên ji aliyê jinan ve tên gotin girîng in û destnîşan kir ku divê dengê jinan ê li Rojhilat bilind dibe li Rojava jî bilind bikin. Aktaş, derbirî ku ji bilî alîgiriya aştiyê tu şenseke jinan tune ye û wiha pê de çû: "Miheqeq gotineke jinan a têklidarî aştiyê heye. Divê em li Amedê hemû bi hev re van gotinan bi dengekî bilind bînin ziman. Ez bawer im ku mîtînga dê li Amedê bê lidarxistin ji bo destpêka têkoşîneke nû ya jinê bibe gaveke girîng."

### Têkoşîn dê bidome

Li ser navê Jinên Partiya Sosyalîst Latîfe Demîrkaya ku axivî, bang li hemû alîgirên aştiyê kir ku tevî mitîngê bibin û wiha got: "Xwezî ev organîzasyon hîn zêdetir li demê belav bibûya. Lê dîsa jî li wir dema nexşeyek rê derkeve dê girîng be. Ev dê bibe destpêkek."

Endama Weqfa Piştgiriya Jinan Gulsen Ulkerav jî, sedema tevlêbûna xwe ya mitînga jinan wiha vegot: "Di van demên dawî de têkildarî çareseriya pirsgirêka kurd ji derdorên cuda, dengên cuda bilind dibin. Em wekî jinan wekî di gelek mijaran de têkildarî çareseriya pirsgirêka kurd jî dîsa yên ku ji bo aştiyê gotinên herî rast bêjin jin in. Ji bo vê yekê em girîngiyê didin vê mitîngê. Wekî Weqfa Piştgiriya Jinan tecrubeyek me ya 20 salan heye, li hemberî şîdeta li dijî jinê û li hemberî şîdeta di nava malbatê de têkoşînek me heye. "

Ji Derdora Jinên Femînîst Nîlgun Yurdalan jî, bal kişand ser wateya mitînga jinan a dê li Amedê pêk bê û wiha got: "Şer û pevçûn bi hemû dijwariya xwe li wir tê jiyîn. Ji bo vê yekê divê mitîng bi hêz derbas bibe." Yurdalan, daxuyand ku bi salane bi endamên DOKH'ê re dixebitin û diyar kir ku di mitîngê de dê bixwazin ku endamên DOKH'ê bên berdan.

### Piştgiriyê bidin DOKH'ê

Seroka Sendîkaya Karkerên Konutan a DÎSK'ê Nebîle Irmak Çetîn, destnîşan kir ku pergal û dewleta mîlîtarîst ji têkoşîna kurdan ditire û wiha got: "Ji ber vê tirsê li hemberî jinan jî pêkutî pêş dikevin û jinan digirin. Ji bo endamên DOKH'ê bên berdan dê tevî mitînga Amedê bibin û destnîşan kir ku dê daxwazên xwe yên ji bo rawestandina operasyanan jî bînin ziman."

Rêvebera Partiya Sosyalît a Stenbolê Feray Mertur jî, daxuyand ku jinên kurd di nava pêvajoya şer û şertên giran de hem zanistiya xwe û hem jî têkoşîna azadiya jinê pêş xistine û diyar kir ku dê piştgiriyê bidin DOKH'ê.

### Mafên wan ji bo axaftinê heye

Ji Teşebûsa 78'an Nîmet Tanrikulu jî, anî ziman ku divê hemû komên jinan, rêxistinên jinan û jinên serbixwe piştgiriyê bidin mitîngê û wiha dom kir: "Wekî jinan divê em binê slogana 'Gotinek em bêjin û hêza me ya guhertinê heye' baş tişî bikin. Lewre mexdûrên esasî yên şerê li vî welatî dom dike jin in. Ji ber vê yekê mafê axaftinê herî zêde ji jinan re dike." Tanrikulu bang li hemû jinan kir ku tevî mitîngê bibin. **ENQERE / STENBOL**



## Ligel zextan qîrîna aştiyê

Şaredara Weranşarê Leyla Guven, bang li hemû jinan kir ku tevî mîtîngê bibin. Guven, daxuyand ku ji bo aştiyê divê jin deng û hêza xwe bikin yek. Guven, da zanîn ku ji bo çareseriyeke demokratîk a pirsgirêka kurd dê li Amêde mîtîng bê lidarxistin û wiha axivî: "Di roja mîtîngê de forûmek dê bê organîzêkirin û her wiha gelek nivîskar û rewşenbîr dê tevli forûmê bibin. Em dixwazin hemû jin tevli mîtîngê bibin. Em wekî jinên Rihayê dê bi girseyî tevli mîtîngê bibin."



## 'Têkoşîna mê hêj bilindtir dibe'

Li Amedê di 31'ê gulanê de "Gihîştina Jinan" tê li darxistin. Endama Meclîsa Jinan a DTP'ê Sener Şahîn, daxuyand ku ji Edeneyê wê tevli mîtîngê bibin. Şahîn, anî ziman ku pêvajoya şer û aşîtiyê di nav hev de diçe. Şahîn, derbirî ku pîştî biryara KCK'ê ya bêpêvçûniyê ya heta 1 hezîranê, li hemberî DTP'ê operasyonan destpêkirine û her wiha tevgera jinan wekî hedef hatiye nîşandin û wiha axivî: "Em di pêvajoyek girîng de derbas dibin. Tekoşîna me hînd bilindtir bûye. Mîtînga me ne tenê li hemberî pêvajoyê ye. Di operasyonê de 23 hevalên me yên jin hatin girtin. Di şaxsê hevalên me yên jin de dixwazin pêvajoya aştiyê, xera bikin. Em bang li jinan dikin li qada mîtîngê, daxwaza aştiyê bilind bikin."

## Navenda Piştgiriya Jinan vebû

Navenda Piştgiriya Jinan (KADEM) ku ji aliyê Şaredariya Sûrê ya Amedê û Miduriyeta Giştî ya Piştevanî û Alîkariya Civakî hate avakirin, bi merasîmekê hate vekirin. KADEM li taxa Hasirliyê hate vekirin û her wiha ji bo KADEM'ê xaniyekî dîrokî hate restorekirin. Şaredarê Sûrê yê Amedê Abullah Demîrbaş û Serokê DTP'ê yê Amedê Alî Şîmşek jî tevli merasîmê bûn. Her wiha nûnerên saziyên jinan û gelek kes jî tevli merasîmê bûn. Di bin banê KADEM'ê de ji bo ku jin karibin xwe li jiyanê bigirin dê perwerdehiyên pîşeyî bên dayîn. **AMED**

## Civînên li taxan didomin

Şaredara Baglarê ya Amedê Yuksel Baran, cîgir û endamên meclîsa şaredariyê li taxên 5 Nîsan û Kaynartepeyê bi gel re hatin cem hev. Civîn li malên gel ku girêdayî Şaredariya Baglarê ne, pêk hatin. Civîna yekemîn li taxa 5 Nîsanê pêk hat. Şaredar Yuksel Baran diyar kir ku dê ji vir şûnde ev civînên wisa dê di nava gel de her tim bidomin û wiha berdawam kir: "Divê gel tevli van civînan bibin û ji bo ku pirsgirêk çareser bibin divê alîkariyê bidin Şaredariyê." **AMED**

## Parlamenteran belavok belav kirin

DOKH, di çarçoveya mîtînga dê di 31'ê gulanê de li Amedê pêk bê de li Kayapinarê belavok belav kirin û banga tevlêbûna mîtîngê li jinan kir. DOKH'ê ji bo "Gihîştina Jinan" a dê di 31'ê gulanê de bi slogana "Gotineke me heye em bêjin, hêza me ji bo guhertinê heye" li Amedê bê lidarxistin, li esnaf û jinên semta Huzurevlerî ya Kayapinarê belavok belav kirin. Parlamenterên DTP'ê yên Amedê Gultan Kişanak, Aysel Tugluk û endamên DOKH'ê jî beşdarî belavkirina belavokan bûn. Jinan li erbaneyê da û bang li jinan kirin ku tevî mîtînga jinan bibin. **AMED**

## Dê bi girseyî tevli mîtînga jinan bibin

Li Bismila Amedê endamên DOKH'ê û rêveberên DTP'ê ji bo tevlêbûna mîtînga dê ji aliyê DOKH'ê ve di 31'ê gulanê de li Amedê pêk bê belovak belav kirin. Li bazara semtê ya Bismilê, ji bo tevlêbûna mîtînga jinan ku dê di 31'ê gulanê de bi slogana "Gotineke me heye em bêjin, hêza me ya guhertinê heye" li Amedê bê lidarxistin, belavok belav kirin. Ari ku li vir daxuyaniyeke kurt da, wiha got: "Bi armanca şermezarkirina hemû êrîşên li hemberî DTP'ê û tevgera me ya jinan pêk tên, ji bo em hêza xwe ya têkildarî pêşxistina aştiya li herêmê nîşan bidin, em bang li hemû jinan dikin ku beşdarî mîtînga dê li Amedê bê lidarxistin bibin dikin." **AMED**

Hawar
29 Gulan 2009 În

# Vexwarineke jêneger 'çay'





Çay 5 hezar sal in ji aliyê mirovan ve tê bikaranîn. Di taştiyê de vexwarineke jêneger e. Piştî nîvro jî gelek mirov çayê vedixwin û kêfeke mezin jê digirin. Her wiha ji bo tenduristiya mirovan jî pir baş e.

Ligel fêdeyên çayê yên ji bo tenduristiya mirovan gelo taybetiyên çayê çi ne? Zirarê dide mirovan? Mînak; gelo çay dibe sedema kêmbûna hesin a di laşê mirovan de? Teîna di nava çayê de gelo zirarê dide tenduristiyê? Dema ku mirov dibêjin "heke ez çayê venexwim bi ser xwe ve nayêm" sedema vê yekê çi ye? Cudahiya di navbera çaya normal û çaya poşêt de çi ye?

Tê gotin ku piştî avê vexwarina herî zêde ku li cîhanê tê vexwarin çay e. Mirovên ku çayê kişf kirine û dest bi vexwarinê kirine têkîliya çayê bi tenduristiya mirovan ve xwestine derxin holê. Cara ewil li cîhanê çay ji aliyê çîniyan ve hatiye kişfkirin û cara ewil wan çay vexwariye. Piştre di sedsala 6'emîn de gihîştiye Japonyayê. Ji vir jî derbasî Endonezya û Hindistanê bûye.

### Rêwîtiyete dûr û dirêj

Li gorî lêkolînan di sala 1615'an de hin kesan çay biriye Înglistanê û li vir di sala 1889'an de çay cara ewil hatiye poşêtkirin. Kesê bi navê Thomas Lîpton bi vî rengî dest bi firotina çaya poşêtan kiriye. Ev kes bi vê xebata xwe derbasî dîrokê bûye. Li Tirkiyeyê jî cara ewil di sala 1878'an de hatiye bikaranîn. Der barê çayê de pirtûtekeke bi navê "rîsaleya çayê" hatiye nivîsandin. Di sala 1924'an de jî cara ewil li Rîzeyê dest bi hilberîna çayê hatiye kirin.

Li cîhanê herî zêde çaya poşetê tê bikaranîn. Lê li Tirkiyeyê herî zêde çaya vekirî tê bikaranîn.

### Du cureyên wê hene

Çaya li welatên Asyayê ji belgên nebata bi navê Camellia Sinensis a ku biçîk e tê hilberandin. Bi taybetî 2 cureyên çayê hene. Ya yekemîn nebata ku belgên wê biçûk in ya duyemîn jî belgên wê mezin in. Dema ku çay tê çinîn di belgên wê de oksîd çêdibe.

Di çaya kesk de enzîmên çayê ji ber germê rola xwe winda dikin û çay zuha dibe û kesk dimîne. Di çaya reş de jî belgên çayê bi tevahî tê oksîdkirin û ji ber vê yekê jî rengê wê reş dibe. Kalîteya çayê jî girêdayî cureyê belgên wê, şert û mercên ku tê şîn dibe, dema çinînê û bi rêbaza çinînê û bi tarzê demkirinê ve girêdayî ye.

**Li cîhanê piştî avê vexwarina ku herî zêde ji aliyê mirovan ve tê bikaranîn çay e. 5 hezar sal in ev vexwarin li ser sifreyên mirovan e. Her wiha ji bo tenduristiya mirovan jî baş e**

### Sûdên çayê

Tê gotin heke çay bi awayekî rast bê demkirin ji bo tenduristiya mirovan pir baş e û gelek sûdên we hene. Weke ku tê zanîn li cîhanê piştî avê vexwarina ku herî zêde tê bikaranîn çay e. Heke bi şekir û şîr ve neyê vexwarin kîloya miravan jî kontrol dike. Ji bilî vê taybetiya xwe çay çavkaniya antîoksîdan e jî. Ev oksîdanên bi navê flavonoid bêhtir di fêkî û sebzeyan de hene. Ji ber vê yekê jî mirovan li hemberî bakteriyan diparêze. Bêhtir jî diranên mirovan li hemberî asîdan diparêze. Ango ji bo tenduristiya diranan gelekî baş e.

Her wiha di lêkolînên ku di demên dawî de tên kirin de li ser têkiliya tenduristiya dil û vexwarina çayê tê rawestandin. Di vî warî de lêkolîn her diçe zêdetir dibin. Dîsa madeya bi navê theanina ku di nava çayê de heye tê gotin ku ji bo konsantrasyona zîhna mirovan baş e û di vî warî de jî pispor û zanyar lêkolînên xwe didomînin. Ango theanin (tenîn) zirarê nade tenduristiya mirovan. Mirovan zindî dihêle. Sedema ku mirov dibêjin "heke ez çayê venexwim hişê min nayê serê min" jî ev made ye. Dîsa di encama lêkolînan de derketiye holê ku çay nabe sedema kêmbêna hesin a di laşê mirovan de. **AMED**

## Ji çîniyan robota aşpêj

Ji bo kesên ku dema xwe zêdetir di mutbexan de bi çêkirina xwarinan derbas dikin pêşketineke nû ya teknolojîk çêbû. Bi çêkirina roboteke nû êdî zehmetiyên di dema çêkirina xwarinê de dê ji holê radibin. Çîniyan robota ku xwarinê çêdike îcad kir. Kesên ku dixwazin xwarinê çêkin malzemeyên xwe yên ji bo xwarinê dikin nava vê robotê, robot jî xwarinê çêdike. Ev robota ku xwarinê dikare çêke li Pekînê di Fuara Teknolojîk ya Navneteweyî de hate pêşandan. Taybetiya robotê ew e ku bi riya înternet û telefona destan bi kumandanyê dikare bê şixulandin. Ya herî girîng jî ev robot di demeke kin de xwarinê amade dike. **PEKÎN**




## Ji pêşerojê bêhêvî ne!

Li Hewlerê berî demekê ahengên derçûnê li çend fakulte û peymangehan ji hêla xwendevanên qonaxa dawîn ve hat lidarxistin. Gelek ji xwendevanan bi germî beşdarê ahengê bûn. Lê piştî dawîhatina ahengan, diltengî û bêhêvîtî di sîmaya piraniya wan de diyar dibe. Lewre ew baş dizanin ku piştî demekê dê zanîngehê biqedînin bê ku hêviya jiyaneke xweştir hebe.

Xwendevanê qonaxa çarem ya Fakulteya Ziman Piştîvan Şiwanî, ji dema ahenga wênegirtina derçûnê ve hez nake ji zanîngehê dûr bikeve. Hemû cihên zanîngehê li cem wî bûne bîranîn. Ew li gel hevalên xwe di dema wênegirtinê de dikene. Lê heke dilê xwe veke, qet bi wê derçûnê ne dilxweş e. Ew wisa hest dike ku çarenûsa wî ji hevalên berî wî ne baştir be. Ji ber ku wan heta niha karekî li gorî pîşeyê xwe nedîtiye û karkeriyê dikin: "Ji niha ve dizanim kar nîn e. Dibe ku piştî derçûna xwe ez li malê rûnim. Ji ber vê yekê naxwazim ji zanîngehê dûr bikevim."

Li gorî rayedarekî Serokatiya Zanîngeha Selahedîn îsal texmîn tê kirin ku nêzîkî 4 hezar xwendevan zanîngehê biqedînin. Lê ew ê ku têbînî li ser tê kirin, beşekî mezin ji xwendevanan ne dilxweş in. Di qanûnê de budçeya 2008'an ya Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistanê ji bo 29 hezar derçûyên zanîngeh û peymangehan dîtina kar hatiye pesendkirin. Lê heta niha gelek ji derçûyên par nehatine bicihkirin. Li gorî rayedarên hikûmetê îsal û piştî pesendkirina budçeya 2009'an nêzîkî 10 hezar derçûyan wê li damûdezgehên hikûmetê bên bicihkirin.



Sekreterê Civata Wezîran Mihemed Qeredaxî jî der barê mijarê de diyar kir ku hikûmet çi projeyek nîn e ji bo bicihkirina derçûyan. Piraniya pisporên başûrê Kurdistanê û bi taybetî pisporên ku li derveyî welat jiyane, teqez dikin ku li piraniya welatên cîhanê ji sedî 90'ê derçûyan derfeta xebata taybet dibînin, ne ku hikûmet karê wan bi rê dixe.

Dr. Muîd Ebdulrehman ku niha Rêvebirê Kontrola Cûriya Herêma Federal a Kurdistanê ye, 22 salan li Kanadayê jiyaye û di yasaya damezirandina çend welatan de pispor e jî got ku di qanûnên çi welatekî cîhanê de nîn e ku derçûyên zanîngehê ji sedî 100 ji alî dewletê ve di kar de bên bicihkirin. Der barê alîkariya hikûmetê ya ji bo derfetên kar ji bo derçûyan de jî Dr.Muîd wiha dibêje: "Li piraniya welatên cîhanê, ji bo derfetên kar ji bo derçûyan bername hene. Mînak ew derçûyên ku nû bawername bi dest tînin, ji ber ku ne xwedî ezmûneke baş in di kar de, hikûmet şensê wan dide şîrketên taybet ku şeş mehên yekem ew bi xwe mehaneya wan dide. Eger derket ew karker çalak e, şîrket wî werdigire. Eger na li derfeta karekî din digere." Sekreterê Civata Wezîran dibêje erkê hikûmetê nîn e ku ji bo hemû derçûyan kar bibîne. Li aliyê din baweriya ciwanan bi sektora taybet nîn e û her berê xwe didine karên hukmî. Wek ev dibêjin sektora taybet li Herêma Federal a Kurdistanê ne çalak e û çi garantiya wê jî nîn e heta ku mafên wan berceste bike. **HEWLÊR** ***(rudaw)***

## Ji bo navçeyeke paqij dixebitin

Şaredariya Serêkaniya Rihayê li dijî heşereyan kolan û cadeyên navçeyê derman dike.

Xebatkarên Şaredariya Serêkaniyê bi germbûna hewayê ji bo ku navçe paqij bike û mêş, pêşî, spî, kêç, mişk, qirnî û heşereyên din zirarê nedin gel dest bi xebatên dermankirina kolan, tax û cadeyan kir. Dermankirin di bin kontrola veterîner û endezyarên hawirdorê de tê kirin. Xebatkarên şaredariyê bi şev û roj bênavber xebatên xwe didomînin. Xebatkarên Şaredariyê diyar kirin ji bo ku xebatên wan encameke baş derxîne holê divê welatî jî alîkariyê bidin. **RIHA**



www.arsivakurd.org